



Amerîka bo çareseriya xwe pî dide ser Tirkîyeyê

# Kurd dê hêza xwe li ser sandoqê bidin der

■ Bi zelalbûna naveroka Komploya Navneteweyî re, derdikeve holê ku armanc û daxwaza bikirên komplojê ji hev cuda ye. Bo nimûne armanca serkêşa komplojê Amerîkayê bi radestkirina Öcalan li ser Tirkîye û kurdan ferzkirina çareseriya xwe ye.

Çend bûyerên ku hefteya çuyî pêk hatin nîşan didin ku Amerîka ji bo pêkanîna çareseriya xwe di nav keftûleştan de ye. Bo nimûne, roja 9'ê avrêlê li


Washingtonê bi beşdariya gelek akademîsyenan civînek pêk hat. Di vê civînê de pest û pêkutuyên li ser kurdan û derdorên îslamî hate rexnekirin. Tê gotin ku di çareseriyê

Amerîkayê de bi tenê mafê çandî heye, helwesta gelê kurd a di hîlbijartinê de dikare pejiwandina îradeya siyasî li ser amadekarên komplojê ferz bike. (Nûçe:R-3)



Hunermend Hekîm Sefkan:

Wêjeya herî bilind strana klasîk e




■ Divê jêderka wêjeya me stranên klasîk ên kurdî bin. Strana kurdî ya klasîk di heman demê de romaneke nenivîsandî ye, bi devkî ye. Dîsa fîlm e. Ji ber vê yekê wêne gelek û dewlemend in. Bêguman ger te ev stran nebihîstibe, diyar e wê helbesta tu binivîsî, wê ne helbesta kurdî be. Divê jêderka edebiyata me ev be. Niha em ne mîna Rûsan in. Çernîşevskî, Puşkîn, Gorkî û Mayekovskîyên me tune ne.

(Hevpeyvîn:R.8-9)



## Azadiya WELAT



E-Mail: s.berbang@usa.net

SAMİ TAN

Serkêşa komploya li dijî gelê kurd Amerîka ye. Di çareseriyê wê de xala yekemîn ziman e. Lê heta roja îro me ne dîtiye ku di tu raporên wê dewletê de çêlî pest û pêkutiyên li saziyên demokratîk ên kurdan hatiye kirin.

Hêzên dagirker û împeryalist li aliyekî jî bo dîlgirtina îradeya gelê kurd çî jî wan tê dîkin, li aliyê din jî jî bo çareseriyê xwe bi gelê me bidin pejirandin ketine nava hinek çalakîyan.

Bo nimûne, dozgerê dewletê di kêliya dawîn de serî li Dadgeha Qanûna Bîngêhîn da, jî bo ku rê li ber beşdariya HADEP'ê ya di hîlbijartinan de bigire. Dozger dibêje, "Dê gelek PKK'yî bibin serokê belediyeyan û dê waliyên dewletê mecbûr bimînin ku bi wan re bixebitin." Li gorî vî mantiqî waliyê ku bi nûnerên gel re danûstandinê neke, divê bi gel re jî danûstandinê neke. Lewre kesên ku PKK'yîyan hildibijêrin jî PKK'yî ne, nexwe waliyên dewletê divê yan şênîyê herêmê biguherînin, yan jî dev ji rêveberiya herêmê berdin.

Serkêşa komploya li dijî gelê kurd Amerîka jî çêlî çareseriyê dîke. Di çareseriyê wê dewletê de, xala yekemîn ziman e. Rojnameya me jî li Tirkiye û bakurê Kurdistanê tekane weşana hefteyî ya xwerû bi kurdî ye. Pest û pêkutiyên li

ser rojnameya me jî jî mêj ve tene zanîn, lê heta roja îro me nedîtiye ku di tu raporên wê dewletê de çêlî wan pest û pêkutiyên hatiye kirin.

Çend bûyerên ku di nava hefteya çûyî de pêk hatin, radeya vê çewsandinê nîşan didin. Roja 10'ê avrêlê hevalên me Davut Erdoğan û Tahir Şensoy li Edeneyê jî hêla polîsên sîvil ve hatin girtin. Polîsan ew birin ber Çemê Seyhanê li wê derê çek xistin devê wan û ew bi kuştinê tehdît kirin. Li ser vê yekê hevalên me civîna çapemeniyê li dar xist, lê vê yekê jî dawî li gef û êrîşên polîsan neanî. Çend carên din jî heman heval jî aliyê heman polîsan ve hatin tehdît kirin. Roja 13'ê avrêlê nûnerê me yê İzmirê Davut Özalp û xebatkarê nûnergehê Songül Sever hatin binçavkirin û piştî 36 saetan bîpîrsiyarî hatin berdan.

Roja 15'ê mehê Berpîrsê Karê Nivîsaran yê Azadiya Welat M. Salih Taşkesen, jî ber daxuyaniyê ku me dabû çapemeniyê, bi salekê cezayê hepsê û milyon û niv cezayê pereyan hatê cezakerin. Cezayê hepsê paşê li 2

milyon cezayê pereyan hate zivirandin. Ev pest û pêkutiyê nava hefteyê ne û li helwesta dewletê ya li hemberî ziman û çanda kurdî nîşan dide. Rewşa saziyên din ên legal jî ne cuda ye. Hêzên dewletê bi dehan car avêtine ser NÇM'ê û hemû xebatkarên wê binçav kirine. Dîsa roja ku ev nivîs dihat amadekirin, îcar hêzên dewletê avêt ser Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê û gelek pirtûk û birek hejmarên rojnameya me hatin desteser kirin. Di nav pirtûkên ku hatin desteser kirin de pirtûka alfabe yê jî heye. Dewlet wê wekî alfabe ya PKK'ê bi nav dîke, bi qasî ku em pê dizanin, xebatkarên beşa kurdî ya Êstgeha Dengê Amerîkayê jî heman alfabe yê bi kar tînin, wate ew jî PKK'yî ne.

Hêviya me jî wan tune. Ji ber ku ew dewlet jî mêj ve bi her awayî li pişt dagirkeran e û di jenosîda li ser gelê me de xwedî roleke berbiçav e. Lê ew helwest nîşan dide ku di çareseriyê xwe de jî nejidil e. Lê gelê kurd dê daxwazên xwe bi wê jî bide pejirandin.

# Hadirê ma Vural savaşı biteqne

## Ferhengok

<b>adan:</b> berdar	<b>dûrebîn:</b> ileriye gören
<b>behremendî:</b> kabiliyet	<b>evdoşekalo:</b> kuliyê
<b>binhişîn:</b> bilinçaltı	mezîn
<b>cangozî:</b> pakrewan,	<b>hîlbijêr:</b> seçmen
şehîd	<b>îloz:</b> gelincik
<b>cemre:</b> pişko, piling	<b>incas:</b> erik
<b>cûm:</b> benîşt	<b>jêderk:</b> çavkanî
<b>cûm:</b> kortikên ku avê	<b>korebîn:</b> dar görüşlü
berfê tê de	<b>îloz:</b> berfin
<b>çavdêr:</b> gözlemci	<b>nanûgermîkirin:</b> şilavî
<b>deng:</b> oy	<b>neşûştî:</b> lanetli
<b>destkar:</b> müdahaleci	<b>niqniqandin:</b>
<b>deverî:</b> yerel	atıştırarak
<b>dilhênîkûn:</b> ferahla-	<b>strîzerk:</b> tolik
mak	<b>têbûn:</b> hilhatin

## RADYOYA MIZGİNIYÉ

### LI EWRÛPAYÉ

Her roja şemiyê (Sebtê) saet di navbera 20<sup>30</sup> û 21<sup>45</sup> an de li ser pêla navîn (MW), 864 kHz.

### LI TIRKIYEYÉ

Her roj şemî û yekşemê êvarî di navbera 20<sup>30</sup> û 21<sup>45</sup> an de li ser pêla navên (MW) 864 kHz

Mizgîni, P.K. 1125  
35441 Biebertal, Elmanya

C.ZERDÛŞT

Ma heftew verên di jî nûstbi ke, vijînayînê 18'ê Nisan çiqas muhîm o. Ma zanê ke, eno vijînayîn yew bêj (çeşit) referandûm o. La belê eno referandûm de qewet û î-nancê millet da ma ra sewbî hema hema heme çî hemverî ma yo.

Dewleta tirkan hema her wext, her ca de wazena ke, verê ma bibirno... Finena ma ser, ma kişena, îşkence kena, rayirê ma birnena. Hema çend rojî ra ver Mêrdîn de, çekî nay mileta ma û çend mêrdimê ma birîndar kerdî. Nizda çarşey-pansey mêrdimî girotê binçim.

Ancî Erxenî di ceniya şehîd Vedat Aydınî û namzeta HA-DEP'a Amedî Şükran Aydın û davîst endamê binê partî giroti binçim. Dîrê rojî ra ver faşîstan û polîsan rayire konvoya HADEP'a Stenbolî Zeytinburnu birna û waşt ke, înan lînc bikirê. Polîsan û faşîstan sey nînan xeylê cayan de vardayin viraşt û seyana mêrdimî giroti binçim.

Ay roj yewerî binçim girotinan

ser, sermeyanê (serdar) HADEP'a Stenbolî ra Yusuf Çirikî ra pers kerd û wast ke bimûso çend kesî girotiyayê binçim. Birêz Çirikî vat: "Qusirê min mewnê hind zafî ke, ma bira niştê hesabê ci tepişê". Keza şarîstananê bînan de jî rewş yewna hewa niyo. Mesela Sêrt, Konya, İzmir û êb.

No vijîyayînê 18'ê avrêlî vêsî muhîm o. La belê eno vijîyayîn di heme çî hemverê ma yo. Di hemverê heme zehmetiyanê serê HADEP'î di jî go reyna HADEP enî vijîyayînî ra bi serkewtin vejîyo.

Walîyê OHAL'î Aydın Arslan' o vano: "Ez vera nêdano wa HA-DEP postê xo de, xo têsêno. Ne î-zin dana ke HADEP pankartan û afîşanê xo bilaqno ne jî, veradana wa buroyan akirê." Şima ra ayse-no walîyê na dewlet vano se? Kê televizyon û rojnaman hewniyênê (ewnenê) HADEP sero hîndasî vardayînî benê mecbûr nêmanê yew tek kelîme nêvanê, nênanw-nênê, nênuşênê. Hezeke (sankî) a-naser yew partî çiniya, hezeke a-

naser partî nê dekewena vijînyaye.

Yew ca ra jî Vural Savaş' o xo dirneno, teqnenno û bacêneno û dawa ser ro dawa akeno. Wazeno ke partî bido padayin (racenayin).

Çirê? Çike Vural Savaş her kesî ra vêsêr (rind) zano ke, HA-DEP'a enî vijîyayînî ra serkewtina vejîyo. O jî zano ke, na seat ra pey kes niştê partî pado. Dêrdê ey verê partî birnayino.

Wazeno ke millet biterso û wa partî bendî (berajî) nêvêro. Zano ke, vijîyayînî ra pey partî padayin zaf mana îfade nêkano. Zano ke, mileta kurd nawê (na fin) verbê kadroyan ew diz-gînî giroti xo dest.

Ma hewayo ke vernî de jî vat; eno vijîyayîn yew bêj ra referandûm o. Ma zanê ke şertê referandûmî jî çiniyê û nêamey ca.

Ma zanê ke, dest û lingê ma girêday, fek û goşê paday û vanê, "bêrê ma yariş bikirê".. Sebena wa bibo, çî vanê wa vajê, ma çî hald benê bibim; goreyê şertanê eyro yewna vijîyayîn çiniyo.

Ma gereka şorê sandiqan ser û ma mecburê cewab bidê înan û Vural Savaş û 19'ê menga (aşm) nisan de Vural Savaşî biteqne.



Welat

# Amerîka bo çareseriya xwe pî dide ser Tirkîyeyê Kurd dê hêza xwe li ser sandoqê bidin der

Digel zelalbûna komploya navneteweyî ya li dijî gelê kurd, armanc û daxwazên kesên ku ew komplo li xistîye jî zelaltir dibin.

Li Amerîka ku ji bo pêşeroja gelê kurd giring e, fêmkirina armanc û daxwaza Amerîkayê ye. Lewre tê zanîn serkêşa komploya ew dewlet e.

Bûyerên ku diqewimin didin zanîn ku Amerîka dixwaze 'çareserî'ya xwe li ser kurdan û kurdan ferz bike. Piştî dîlketina Öcalan, di çapemeniya Amerîkayê de ji kurdan û tirkan hate xwestin ku, bi awayekî tevbigerin, da ku Kêşeya Kurd çareser bike. Di vî warî de li Tirkîyeyê jî hêza xwe di nava xebatê de ne. Bi taybetî Doğu Ergil di vî warî de darî çareserî dibin. Li gorî agahiyên ku bi dest keftin, weqfa ku Ergil serokatiya wê dike SAJ belgeyêke lihevkerîna amade kirin û ew belge bi îngilîzî û tirkî çap kirin. Weqfê xwestiye bi kurdî jî belgeyê çap bike. Lê rê li ber hatiye girtin û dozgerê ME'ê lêpirsîn daye destpêkirin. Di vî warî de tê xwestin ku riya derbirinê jî xwe bi dest vebe.

## Girtina HADEP'ê ne bi dilê Amerîkayê ye

Xebatên Amerîkayê bi vî yekê jî naqewimî. Hin caran Amerîka dîtîna û ramanên xwe bi riya hinek rojnamegeran jî derdibe. Hinek rojnamegerên tirk ên ku li Amerîkayê dixebitin gelekî giring e. DYA'ya xwe bi wan dide nivîsandin. Yek ji wan rojnamegeran, qunciknivîsa Millîyetê Yasemin Çongar e. Di nivîsa Çongarê ya roja 12'yê avrêlê de li ser polîtîkayên Amerîkayê yê derbarê kurdan de wê wê rastîyan dipejirand. Di nivîsê de hatiye gotin ku Amerîka li hemberî PKK'ê bi her awayî piştevaniya Tirkîyeyê dike, lê ew piştevaniya ku riya xweifadekirinê li ber kurdan vebe, nasnava kurdan bê pejirandin, lê li ber perwerdehiya bi kurdî û weşandina zimanê kurdî vebe. Her wiha hatiye daxuyandin ku Amerîka nikare nêzîkî dayîkên Tirkîyeyê ya li dijî sazîyên legal ên kurdan bipejirîne. Lewre jî êrişên li ser HADEP'ê û girtina wê partiyê ne bi dilê Amerîkayê ye.

## Pêşeroja demokrasiyê di xetereyê de ye

Li gorî nûçeyêke ku roja 15'yê avrêlê di rojnameya Starê de hatiye weşandin, di 15'yê mehê de li Washingtonê bi sernavê "Li Tirkîyeyê Siyaset û Pêşeroja Demokrasiyê" civînekê hatiye lidarxistin. Gelek kesên tirk û amerîkî (Marc Grossman, profesorê bi navê Şerif Mardin, Kemal Kirişçi, Hakan Yavuz, Ahmet Evin, Wladimir Wilson û rojnameger Cengiz Çan-



Gelê kurd piştî dîlketina Abdullah Öcalan dest bi serhildanan kir û hêza xwe ya siyasî nîşan da. Li jor dîmenek ji Newroza Mêrsînê tê dîtin.

dar) di vî civînê de beşdarî kiriye û di helwesta Tirkîyeyê bi tundî hatiye rexnekirin. Di civînê de hatiye gotin ku rêveberiya Tirkîyeyê di destê leşkeran de ye, lewre pêşeroja demokrasiyê di xetereyê de ye. Her wiha hatiye gotin ku piştî hilbijartinê dibê ku FP û HADEP werin girtin. Di civînê de xala herî giring jî ev e: Li ser kurdan û misilmanan zordarî heye.

Daxuyaniya ku polîtîkayên Amerîkayê li ber çavan radixe, jî nivîskarê tirk Çetin Altan hat. Altan di hevpeyvîneke ku kovar Aktüelê pê re kiribû de, da zanîn ku bo Kêşeya Kurd çareseriya demokratîk li ber dêrî ye û li pey wê jî çareseriya Kêşeya Kîbrîsê heye. Li gorî Altan di warê çareseriya Kêşeya Kurd de, di navbera Amerîka û Ewropayê de dubendî heye. Li pey boçûna wî, Ewropa çareseriya siyasî û Amerîka jî çareseriya demokratîk dixwaze. Altan îdia dike ku di çareseriya siyasî de bi PKK'ê re li hev rûniştin heye, lê çareseriya demokratîk vî yekê li ser Tirkîyeyê ferz nake, tenê dixwaze ku nasnavê gelê kurd bê pejirandin û di nava sistema Tirkîyeyê de bo kurdan mafê derbirinê hebe. Altan dîlgirtina Öcalan û girtina MED-TV'yê jî, wekî serkeftina Amerîkayê li dijî Ewropayê dibîne. Çetin Altan diyar kiriye ku dewleta tirk nikare li hemberî Amerîkayê li ber xwe bide û bivê nevwê de çareseriya wê bipejirîne. Li gorî Altan çareseriya demokratîk li berjewendiyên kurdan jî tê.

## Divê PKK legalîze bibe

Tiştêkî ku di vî warî de balê dikişîne jî daxuyaniya Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan e. Serokê Giştî yê PKK'ê Öcalan roja 6'yê avrêlê bi riya parêzerê xwe Mahmut Şakar daxuyaniyek da çapemeniyê. Di vî daxuyaniyê de jî di bin

çavdêriya Neteweyên Yekbûyî, Yekîtiya Ewropayê û Rêxistina Ewlehi û Hevkarîyê ya Ewropayê de qedandina şer heye. Öcalan dixwaze ku efûyêke giştî were derxistin, riya xweifadekirina kurdan were vekirin. Li ser vî bingehê Öcalan jî PKK'ê jî xwestiye ku ji bo legalbûnê xwe amade bike. Ev daxuyaniya Öcalan pîrsa bi rengê 'Gelo Amerîka bi Öcalan re bazara hin tiştan dike?' tîne rojevê.

Tiştêkî ku zêde li ser tê rawestandîna jî, rola HADEP'ê ye. Ji êrişên hêzên dewletê yê li ser HADEP'ê tê fêmkirin ku, derdorên şerxwaz naxwazin HADEP beşdarî hilbijartinan bike. Bi taybetî generalên tirk, jî mîj ve tîrsa xwe ya der barê HADEP'ê de tînin ser zimên. Niha wekî berdevkê tîrsa MGK'ê jî Serdozgerê Dadgeha Bilind a Tirkîyeyê Vural Savaş derdikeve pêş. Savaş jî bo rê li ber beşdariya HADEP'ê ya di hilbijartinê bigire, cara duyemîn serî li Dadgeha Qanûna Bingehîn da. Di serîlêdana Savaş de di hate gotin ku bi beşdariya HADEP'ê dê gelek PKK'yî bikevin parlamentoyê û rêveberiya belediyyan bi dest bixin. Ev gotina Savaş bû sedema nixandîna bi rengê, dê HADEP benda %10 derbas bike. Ev daxwaza Vural Savaş roja 14'yê avrêlê jî hêla Dadgeha Qanûna Bingehîn ve hate redkirin.

Dengê ku HADEP bigire jî hêla kurdan ve jî wekî referandûmekê tê dîtin û lewre jî digel hemû pest û pêkutîyan jî, gelê kurd dest navêje çalakiyên beşdariya HADEP'ê asteng bike. Tê gotin ku wê gelê kurd bi hêza xwe ya di hilbijartinê de karîbe destkeftinê xwe zêdetir bike û daxwazên xwe li ser dewleta tirk û hevalbendên wê Amerîkayê ferz bike.

NAVENDA NÛÇEYAN

## Kurtenûçe

### ARGK'ê avêt ser Afrînê

Li gorî agahiyên, hêzên ARGK'ê roja 11'yê avrêla 1999'an avêt ser Afrînê li ser Dihokê. Di cerdê de gerilayan lojmanên berpîrsên PDK'ê dana ber roketan. Hate gotin ku digel avahiyên leşkerî û îdarî êstgeha Radyoyê jî bi roketan hatiye kutan û agir bi avahiya asayîşê ketiye û sê erebeyên leşkerî jî hatine rûxandin. Diyar bû ku hêzên PDK'ê çek li gerilayan neteqandine û hêzên ARGK'ê bêziyan vegeriyan baregehên xwe.

### Li Geverê 12 kes hatin kuştin

Encama çalakiya ku 8'yê avrêlê li Geverê pêk hat, diyar bû. Çavkaniyên ARGK'ê da zanîn ku di encama çalakiyê de 12 kes hatine kuştin. Li gorî agahiyên ji çavkaniyên herêmî, hêzên dewletê cendekê kesên ku hatine kuştin, xistine tûrê cendekan, bi wî şeweyî ew jî cihê bûyerê hatine birin. Her wiha hate daxuyandin ku hêzên dewletê cendekê assubayê ku di çalakiyê de hatine kuştin şandiyê Edeneyê, 8 kesên bi xedarî birîndar in, niha li Newxexaneyê Wanê têne girtin.

### Li gelek cihan pozberî

Li gorî Ajansa DEM'ê li gelek deverên Kurdistanê şer derketiye û hejmarek ji hêzên dewletê hatine kuştin. Hate gotin ku roja 7'yê avrêlê hêzên ARGK'ê li Dêrsimê avêt ser girekî ku lê parastina leşkeran tê kirin li wê derê leşkerekê hatiye kuştin, 2 leşker jî birîndar bûne. Di sa li çoltera Mêrdînê şer derketiye, di şer de tîmekî bi navê İzzethan Yanaç hatiye kuştin û 2 tîm jî birîndar bûne. Li Silopiyê jî gerilâ kemîna bombeyî daniye ber leşkeran di vî bûyerê de 3 kes hatine kuştin, 5 kes jî birîndar bûne.

### DYA INC'ê li Başûr bi cih dike

Li gorî rojnameya Independent, Amerîka dixwaze hêzên Kongreya Neteweyî yê Iraqê (INC) di bin parastina heralî de li Başûr bi cih bike. Tê gotin ku hêzên kurd ji bo ku beşdariya di INC'yê de bikin û tîkiliyên xwe ji rejîma Baxdayê qut bikin, parastîneke heralî dixwazin. Helwesta Amerîkayê ya piştî Şerê Kendavê baweriya gelê kurd bi DYA'yê şikandibû, lewre jî YNK û PDK bi tîrsa reaksiyona gelê kurd xwe li giraniyê datînin.



# Piştî Somalî, Iraq, Afqanîstan, Sûdan û Bosna-Hersekê Globalîzmê xwe li Yûgozlawyayê da der

Şeş komar, pênc netewe, sê ol dinava rêxistinekê de bi awayekî rengîn li Yûgoslawyayê dijiyan. Piştigirî, wekhevî û azadiyê; aşî û biratî xistibû navan van rengên cur bi cur.

Lê piştî hilweşîna bloka sosyalîst, Yûgoslawyaya Tito jî tîk çû. Jiyanê gelê Yûgoslawyayê serobino bû. Kete bin bondora kapîtalîzmê û zagonên globalîzmê. Li gorî vê, piştigirî û wekhevîyê cihê xwe ji reqabet û bihevketinê re hişt. Defterên berê derketin holê. Hemû cudatîyên gelan bûn sedema lihevketinê. Di hêla etnîkî, olî û stratejîk de hesabên nû bûn sedema nakokiyên.

## Di serdema osmaniyan de herêma Balkanan

Di destpêka deftera dîroka nakokiyên Balkanan de serdema desthilatdariya Osmaniyan tî dîtin. Di encama şerê Mohaç, Kosovaya yekemîn û duyemîn û peyre jî, bi bîdestxistina Belgradê re Osmanî li wê herêmê bûn desthilatdar.

Osmaniyan gelê tirk li wir bi cih kir, gelê herêmê di nav wan de pişaft. Bi zorê beşek ji gelê herêmê kire misilman. Baca serê her mirovê ku nebû misilman jî zêde bû. Dîsa, ji bo gihandina devşirmeyan zarokên herêmê hatin berhevkerin û anîn Stenbolê. Zarokên ku ji dîrok û esl û neslê xwe dûr mezin bûn ji bo dagirkerî û talankerîya osmaniyan xebitîn. Sokullu Mehmet Paşa jî mîna keke navdar e. Dîsa Osmaniyan qîzên bedew û serwest ji bo xizmetkarî û carîtiyê anîn qesrên xwe. Yê ku li ber xwe dan jî bi rêbazên zordar û hovane hatin kuştin. Lê li hemberî van êrişan berxwedan jî pêk hatin. Heta bigire sirpan jî berpirsiyarên Osmaniyan kuştin û dar kutan bedena wan.

Bi pêşveçûyina kapîtalîzmê re Ewropa di hêla leşkerî, aborî û rexistinî de xurt bû. Netewetîyê jî ji bo serxwebûnê gel hişyar kirin. Dîsa di herêmê de xurtbûna împaratoriya Awûstûrya-Macarîstanê jî hevkeşeya herêmê guhart. Ji ber van sedeman dewleta Osmanî li herêmê qels bû. Bi tekçûna dagirkerîna Viyanayê re, Belgrad jî destê Osmaniyan derket. Di encama şerê Balkanan (1911-12) û Şerê Cîhanê yê Duyemîn de Yûgoslawya hate dameziran-din.

Yûgoslawyayê di nav welatên Cîhana Sêyemîn de cih girt. Di warê etnîkî de sirp, makedon, hirvat, boşnak, arnavût: di warê olî de misilman, xiristîyanên (ortodoks û katolîk) bi hev re dijiyan.

## Guherîna refgirtina dualî

Bi tekçûna Sovyetê re aliyekî refgirtina dualî hilweşiya. Refên kapîtalîzmê jî stratejiyên nû afirandin. Dewletan xwest ku hemû girêkên di cîhanê de ji sermayedarên xwe re vebikin. Di destpêkê de ramana globalîzmê hate belavkirin. Peyre jî li gorî vê berjewendiyên xwe di cîhanê de dane rêzê. Cara yekem hêzên împeryalist li rojhilat Qeyrana Kendavê derxist û êriş

bir ser Iraqê. Hemû teknoloji û taktîkên xwe ceribandin. Peyre wan êriş birin ser Somalî, Bosna-Hersek, Sûdan û Afqanîstanê. Her wiha çav berdan mîrata Sovyetê.

Keda erzan, madeyên xav û zêde, bazara birçiyên kapîtalîstan madê kompaniyayên li ser neteweyan (ulusarüstü şirketler) fireh dikir. Lê ji bo vê divê pergaleke nû û ewlekarî hebûya. Çawa ku peşiyê bi Doktirîna Trûman û peyre jî bi ya Rosvelt re li pey şerê Cîhana Duyemîn Ewropa,

Împeryalîzmê di destpêkê de ramana globalîzmê belav kir. Peyre jî li gorî vê berjewendiyên xwe di cîhanê de dane rêzê. Cara yekem li rojhilat Qeyrana Kendavê derxistin û êriş birin ser Iraqê. Hemû teknoloji û taktîkên xwe ceribandin. Peyre êriş birin ser Somalî, Bosna-Hersek, Sûdan û Afqanîstanê. Di dawiyê de berê da Kosovayê



Di navbera gelên sirb û arnavût de tu nakokî tune. Encama şer û pevçûnên ku îro li ser rûyê cîhanê rû didin, dubendiyên di navbera serdest û bindestan de balê dikişînin. Û her wiha rûyê împeryalîzmê yê rastîna eşkere dike.

Tirkiye, Yewnanîstan, Îran, bi alîkariya Amerîkayê ya aborî û leşkerî ve bûbûne xetêke dorhêla Sovyetê. Bi globalîzmê re jî NATO'yê bi roleke nû ve bar hilda ser xwe û ji bo parastina berjewendiyên kompaniyayên li derveyî netewan dişuxule. Li gorî vê, Rojhilata Navîn, Balkan û Kafkasya herêmên stratejîk in. Ev der hem ji bo ewlekariya berjewendiyên aborî û hem jî ji bo ewlekariya jiyana kapîtalîzmê cihên girîng in.

Sixurên CIA'yê li gorî bernamê û peşnûmeyan, peşiyê diçin li hin herêman aloziyan derdixin, nijadperestîya herêmî gur dikin û gelan berî hev didin, peyre vediguhêzînin pirsgirekên siyasî. Û di encamê de dewletên împeryalist bi awayekî fermî destkariyê dikin.

## Berjewendiyên kapîtalîst nijadperestiyê vedijîne

Gelên rojavayê Ewropayê cermen in. Yê Balkanan jî bi piranî slav in. Di hêla olî de jî ortodoks in. Bi vî awayî jî Yewnanîstanê heta Balkanan, ji herêma Baltîk

heta Rûsyayê xetêke ortodoks û silav derdikeve holê. Eger ev taybetî di dewsa bîrdoziya sosyalîzme de cih bigire dê ji bo Amerîkayê û rojavayê Ewropayê bibe pirsgirekeke kûr û giran. Gava ku nijadperestî an jî olperestî di vê xetê de ji hêla aborî, leşkerî û siyasî ve xwe ji nû ve ava bike, tirs û xofêke nû derdixîne hole. Çimkî bandora vê dê xwe li ser gelên Rojhilat, Amerîkaya Lafînî, Başurê Rojhilatê Asyayê, Başur û navenda Afrîkayê bide der. Ji ber vê parçekirin û lêdan bûye rêbaza qidûmşkenandinê.

Rewşa Yûgoslawyayê jî ji bo nijadperestîya herêmî û lihevexistinê firsendeke mezin da împeryalîstan. Bi taybetî jî rewşa Kosovayê û rûdanên li wir balkêş bûn. Ji ber ku Kosova ne komar bû. Lê herêmeke xweser (özerk) bû. Xwedî hêzên ewlekariya navxweyî bû. Gel bi zimanê xwe perwerde dibû, dibistan ava dikirin. Dîsa meclîsa Kosovayê jî hebû. Lê piştî ku nijadperestî derkete hole gelê Kosovayê di vê hêlê de zehmetî kişandin.

Miloseviç ev mafên gelê Kosovayê ji destê wan girt. Çimkî ditirsiya ku ger bi vî

tehrî bimeşe Kosova dê beşdarî Albanyayê bibe. Xetêke misilman û xweyê dî hêzê derkeve hole. Ev yek dê li hemberî xeta berjewendiyên slavan bibe asteng. Lê wekî tê zanîn, di bin serokatiya Miloseviç de dema ku hirvat û makedonnan azadî xwestin hêzên sirp xwe bi xwe ji herêmên wan derketin û ji hêla siyasî ve jî ew naskirin. Slav û Ortodoksên hirvat û makedonnan ji hêla veqetîna ve sirp ne tirsandin. Ji stratejiya sirpan re xetereyekê bingehîn dermedixest holê.

Li hemberî vê helwesta sirpan, Bosniya jî di bin serokatiya Rûgova de ji 1993'yan vir de serxwebûnê dixwaze. Amerîka alîkariyê didê. Lê vê yekê têrê nekir. Ji bo vî UÇK hate damezrandin. Di 28'ê reşemîya 1998'an de dest bi şerê çekdarî kir. UÇK dixwaze ku gelê Kosovayê Albanyayê bigihîne hevdu û dewleteke yekîtiya gelê arnavût biparêze, damezrîne. Ji bo van daxwazên xwe UÇK alîkariya Amerîkayê û Ewropayê digire. Di dawiyê de erîşên li hemberî sirpan tene darxistin jî vî rastiyê diyar dikin.



# Çend biwêj û şayesên karîger

den dervîş açlığında gebermiş.  
**Neheqî palasa kerê ye, kes navêje ser xwe:**  
**Mîrov cilika xwe ji avê derxe jî baş e:** Gemisini yürüten kaptan.  
**Mîxên mejiyê min leqiyân:** Beynim sulandı  
**Mêvanê sihîda mahrûm bû ji her du îda:** Dimyata pirince giderken evdeki bulgurdan oldu.  
**Mû li zimên nehebilîn:** Di axaftinê de wekî bilbil e.  
**Mû ji xwe şaş nake:** Hiç tınmıyor.  
**Ne hilanî ne danî:** Fikir beyan etmedî  
**Ne da ne stand di cih de mir:** anında can verdi  
**Napeyive, napeyive, ku di depeyive dibêje 'deve':** Tiştên ji edetan der dibêje.  
**Nakeve tu firaqan:** Bi kalıba girmiyor  
**Nigê xwe rada:** Boyundan büyük laf etti.  
**Nok tê li kokê:** Zarok li bav û diya xwe diçe  
**Pertavdanîn:** Teslîm bûn, ji desthilatî nînê ketin  
**Pincarê ber her girarê:** Her şeye

maydanus olmak  
**Pir zaneyo, pir xesiriyo:** Çok bilen çok yamılır  
**Pelê wî ji darê weşiya:** Adı anılmaz oldu  
**Peyva wî ser girt:** Taşı gedigine koydu, laf yerine buldu.  
**Pêli cihê şil nake:** Yaş tahtaya basmaz  
**Riya şînê ji şînê re ye:** Her şey zamanında yapılmalı  
**Stêrka wî/wê li ezmanê heftan tune ye:** Siûda wî tune.  
**Serê wî serê teqereqê ye:** Başı beladan kurtulmuyor.  
**Stêrka wî çû ava:** yıldızı söndü, havası söndü  
**Sing ji binî rakir:** Meseleyi kökten haletti.  
**Singê wî rakir:** Kök söktürdü.  
**Singê wî şidand:** Onu köşeye sıkıştırdı.  
**Şeko navê xwe li xelkê ko:** Sücê xwe dike pêşa xelkê  
 Kendi suçunu başkasına yüklemek  
**Tiliya mirov xwîn bibe pê da namîze:** Günahını bile vermez  
**Tirs tê firandin:** Gef lê xwarin, çav-tirsandin

**Tiştê avêt ber dilê xwe:** Açlığımı bastırdı. (Atıştırmak)  
 Te navika wî biriyê? (Tu di salê wî de yî?)  
**Teyre bê per û bê bask e:** Zehir gibi  
**Tira wî ji cihê germ tê:** Arkası kuvvetli  
**Tu bi berketî:** Te fêm kir  
**Wekî benîştê mezeloqê ye:** Wekî qıra qametê ye. (Sakız gibi yapışkan)  
**Wekî keleka ser avê ye:** Bêhawa ye (sağı solu belli olmaz)  
**Wekî pîneyê vajî ye:** Wekî paçe pîsû ye:  
**Wekî riya kakişînkê ye:** Bitmez tükenmez.  
**Wekî kerê ku ba bi ber guhan bikeve:** Sağır duymaz uydurur.  
**Xeta xwar ji gayê pîr e:** Balık baştan kokar  
**Xulqtengî:** Sinirlilik  
**Xwe li ber piyê mirov dike ax:** Pir hurmetkar e  
**Xwediyê serbrê milûkê Misirê:** Sabreden dervîş muradına ermiş.  
**Xwediyê xiyarê çilmisî, ne dixwe, ne dide kesî:** Var yemez,  
**Xwe dide ber agirê germ:** Xwe li cihê germ digire. (Çıkarının nerde olduğunu bilir.)  
**Yek kêr e, yek penêr e:** Pir başı didin distînin.  
**Yê bikeve govendê divê xwe bihejîne:** Hamama giden terler  
**Yê xelkê sor e, zer e, yê te ji dinyê der e:** Her tiştê te ji edetan der e. (Qediya)

SAMÎ BERBANG

18'ê avrêlê

NEJDET BULDAN



E-mail: oramarbuldan@online.de

**B**elê bawer dikim ku dema ev nivîs digihîte destê we, hilbijartina Tirkiyeyê diqede. Ji ber ku rojnâmeya me Azadiya Welat, demeke dirêj e ku nagihê destê me. Em nizanin kengî derdikeve. (Sedemê wê jî astengiyên dewleta tirk in.)  
 Em di vê nivîsa xwe da dê qala hindê mirovan bikin. Wekî prensîbên bingehî ez naxwazim qala kesayetiyên bikim. Lê belê ji bo Kurdistanê û Tirkiyeyê kesayetî jî pîvanek e.

Li herêma Culemêrgê çalakiyê fedayî li hemberî waliyê herêmê pêk hat. Paşê berendamê ANAP'ê yê duyem Osman Dara bi destê gerilayan hate revandin. Dema ev nivîs di hate nivîsandin me tu agahî li ser rewşa Dara wernegirtibûn. Tiştê me zanî hem çalakiya li dijî walî, hem jî revandina Osman Dara bûn sedemên êrîşên giran yê dewleta tirk li ser welatparêzan.

Berendamên DYP'ê yê Culemêrgê sê kes in. Hakkî Töre, Mustafa Zeydan û Fevzi Özbek.

Di listeyê de yekem Hakkî Töre, mirovekî ji eşîreta Beyzadeyan e. Ew serokcehş e. Destên wî bi gelek xwîna gerilayan gemar bûye. Bi tirkî nizane. Lê ji bo dewletê zimanzan ne pêwîst in. Xwefiroş û qatîlên kurdan biqedirtir in.

Duyem Mistefa Zeydan e. Ji ber ku partî guhartinê, ew di vê hilbijartinê de ji hêla partîya xwe ve hatiye cezakirin. Mexlûqatekî binav û deng e. Kurd wî baş nas dikin.

Sêyem Fevzi Özbek e. Ji eşîreta Giraviyan, kurê Cemil ê Simahîl Axa ye û serokcehş e. Bapîrê wî di Serhildana Beytûlşebabê de gelek leşkerê tirkan kuştibûn. Niha jî ew bi kuştina şervanên azadiyê tê naskirin.

Berendamên ANAP'ê yê yekem Macit Pirozbeyoğlu ye. Gelek salan serokatiya Belediya Çelê (Çukurca) kiriye. Axayekê ji eşîra Pinyanişiyân e. Xizmê Zêbariyan û dostê mala Barzaniyan e. Welatparêz bû. Li dijî çehşîniyê bû. Paşê 89'an nebû berendamê belediyeyê. Sazûmankarekî ÖZDEP'ê bû. Paşê bû endamê DEP'ê. Lê niha mixabin ji partiyê nebaş berendam e.

Berendamê ANAP'ê yê duyem Osman Dara ye. Ji eşîra Diriyân kurê Xalit Dara ye. Xalit Dara jî mirovê dewleta xwe ye. Berî ku serhildana bi serokatiya PKK'ê dest pê bike, wan pir harîkariya PDK'ê dikir. Lê mixabin ew jî niha wekî mirovê dewleta tirk tê naskirin. Osman, ji sê kesên yek e ku

yekemîn li Gewerê endamtiya PKK'ê dikir. Berî 80'yê hate girtin û dest ji şoreşkeriyê berda. Dema ev nivîs amade dibû jî dilê destê PKK'ê bû.

Berendamê CHP'ê yê yekem Esat Canan e. Avûkat e û îstîqrara wî çînîne. Ji malbata wî pir şehîd û gerilla hene. Lê belê mixabin tirsaya wî ji welatê wî mezintir e.

Berendamê FP'ê yê yekemîn Ewliya Parlak e. Bürokrat e, ji Çelê ye û endamê kevn yê Meclisa Şewirmendan (Danîşma Meclisi) e. Pismamê Pirozbeyoğlu ye, hemû jiyana wî ya heya îro di keft û lefta ji bo ku careke din bikeve meclisa tirkan de derbas bûye.

Partiyên din û berendamên wan pêwîst nîn e (û cih jî nîn e) ku em qala wan bikin. Gotîneke herêmî dibêjin "Girara dev sotinê nîn in."

Çima me navên wan mirovan nivîsî? Dibe ku xwendevan bipirsin. Partiyên ku bûne hêviya dewletê li dijî HADEP'ê ev in. Û berendamên ku heke HADEP ji astengiyên dewletê xelas nebe biçin meclîsa tirkan jî ev in. Heke HADEP baraja tirkan derbas bibe dê sê nûnerîtiya Culemêrgê kar bike. Heke derbas nebû jî careke din nûnerîtiya herêmê dikeve destê çehşan, tirsonekan û geyê kêhruşkan. Dibe ku neyê zanîn wateya "güyê kêhruşkan" çi ye. Kurtiya wê, ne bêhn jê tê û ne jî bi mirovê ve dimîne.



# Tenê sê roj mabûn...

**M**e herduyan jî an bi sebeb an jî bêsebeb xwe li bajarê Stenbolê girtibû. Ma em herdu tenê bûn? Bi milyonan gelê me, xwe li vî bajarê qirêj girtibû. Ez ne bawer im, tu mirovê bêje ez kurd im, ji vir hez bike. Nalet lê be! Ji ber ku jiyana vir ne tu jiyana e... Yê ku malê wan, gundê wan hatiye şewitandin, reviyane xwe spartine vî bajarî. Bi rastî ne tenê ev bajar metropolên tirkan giş wisa ne.

Malbat hebû ku li welêt xaniyên wan wekî koşkê bû. Ji ber ku giş hatin şewitandin, reviyane vî bajarî. Ji bo xwe bi rehetî bi cih bikin. Yên ku li welêt di xaniyên xweş de bûn, li Stenbolê ketine "kox" an jî "pînikan." Carna sohbetên me û dayikan li dar dikevin. Em ji wan dipirsin: "Gelo hûn dema li welêt bûn rehetiya we, însanên li derdora we giş xweş û xweşik bûn. Ma hûn li vî derê aciz nabin?" Dibêjinê me: "Belê. Em aciz dibin. Lê em vî acizbûnê didin berçavê xwe lê bêrûmetiyê nadin ber çavê xwe." Ez bawer im, ev bersiv êdî devê mirov digire.

Belê. Ji me re jî sê roj mabûn. Em jî di kuçeyêke teng a Stenbolê de, di xaniyekî, ku yê berê jê re dibêjin "xaniyên ermen û yewnan" de diman. Dema me kirê kir, mirov nikaribû gava xwe biavêta hundir. Ne diwar ne şibake, tu tiştê tunebû. Lazim bû, em malê ji nû ve ava bikin. Mirov dema di nêrdivanê re hildikişiya, te digot a niha wê giş were xwarê. Ji ber ku nêrdivan textî û riziya bûn. Xwedê zane sed sal berê hatibû çêkirin!

**Tenê sê roj mabûn...!** Mala me sê ode bû. Ez dibêim sê ode hûn bêjin sê koxê mirîşkan. Di du odeyan de hevalekî me û pîreka xwe tê de diman. Tenê odeyek ji me re mabû. Em jî sê kes bûn. Carna jî Farqîn dihate cem me. Em dibûn çar kes. Carna jî mêvan dihatin. Em dibûn pênc, şeş, heft û heta heşt... Gava mêvanê me dihatin, me nivîn li kêleka hev radixistin û bi rêzê diketin nav cihan. Heta sibê, bi ser piştî em radizan. Mirov nikaribû xwe bilivanda. Çend hevalan dikir xirînî. Ji ber xiriniya wan, xew li me diherimî. Hevalan carna ji min re jî digotin, tu jî dike xirînî!

Hevalê Ehmo ji ber ku qelew bû, cihê du kesan digirt. Her êvar te ji min re digot: "Kontenjan tijî ye na na?" Hevalên ku bi derengî bigotana: "Ez îşev mêvanê we me!" Me digot: "Tu dereng mayî! Kontejana me îşev tijî ye!"

**Tenê sê roj mabûn...** Di nava odeyê de, me du ben girêdabûn. Dema me cilên xwe dişuştin diavêt ser wan benan. Peyre ji bo ku ziwa bibin, da ku em serê sibê li xwe bikin, me devê

"sobeya xwe ya elektrika ji kebanê" vedikir. Malmîrat! Dema me devê we vedikir, nava çilê zivistanê kevir bibariya jî, ode dikir wekî cihenem û bîna tursil û sabûna diket odayê. Nava nîve şevê em ji xew radibûn, ku qirika me ziwa bûye. Wekî mirov li çolên Afrîkayê tî be û xwe dirêjî avê bike. Dema Farqîn wê şevê bihata malê, cihê herî xweş wî digirt. Bataniya xweşik, lihêf û balîfa xweşik wî desteser dikir! Bi emrê xwe ji min mezin-tir bû. Çar pênc zarokên wî jî hene. Loma me jê re digot: "Tu bavo yî!"

Televîzyoneke me ya biçûk jî hebû. Dema qûmanda biketa destê Farqîn, heta yekê şevê maç bi me dida

temaşekirin. Tiştêki tesadûfî jî, Farqîn şemî û yekşemê dihate malê...!? Şevên Farqîn û Ehmo ne li mal bûna, min û te balîf û lihêfa xweşik ji destê hev direvand. Bi henekan, te zarî min dikir û min jî zarî te dikir. Carna min aliyekî bataniyê, te jî aliyekî din digirt û me ji destê hev direvand. Wê şevê Ehmo li mal bûya, tim dihat ji destê me distand û diavêt ser xwe. Min û te li hev dinihêrî û me xwe diavêt ser Ehmo.

**Tenê sê roj mabûn...!** Tu pir geriyabû. Te gelek tişt bi çavê serê xwe dîtibûn, çî li welêt çî jî li derveyî welêt. Tu bîrbir û zana bû. Tecrûbeyaya te hebû. Tu pir bi serê xwe mabûyî. Xwarina herî xweş te çêdikir. Tê bîra te? Şiv tim te çêdikir û mirov pê re tiliyê xwe dixwar. Ehmo gelekî hez ji xwarina te dikir. Te ji Ehmo re digot: "Pir xwarinê nexwe. Tu bûyî wekî Orangûtan." Ew jî ji ber qelewbûna

xwe aciz dibû û digotê te: "Tu jî ewqas xwarinên xweşik çêneke!"

**Tenê sê roj mabûn...** Me qala dîlanên li Kurdistanê dikir. Tu zanî ne dawet li vir tu dawet in ne ji çanda vir. De ka were me

azadiyê ye. Xweş tê guhê mirovan. Tê derdixî ji ku tê?

**Tenê sê roj mabûn.** De ka em ber pê ve herin! Şal û şapik jî pir li te ketine. Ne tenê yê Amedê, ê gelek bajarên kurdan. Mirov dema li xwe dike, xwe wekî zava dihesibîne. Min qala zava kir. Tê bîra te dema klanê li ser zava dihatin gotin, yek jê tê bîra min. Ger tu dixwazî, ez ji te re bêjim Zava zava zava zava Lo lo loy zava Ev zavakê vî biharê Lo lo loy loy zava...

Belê bihar. Bihar xweş û şinahî Ceng e, xilasî ye. Dawetên herî xweş li biharê li dar dikevin. Meha adarê meha dîlanê ye. Ew du roj in tu ji Helebçeyê hatî. Zarok û dayikên Helebçeyê jî ji bo dîlan mezin, xwe amade dikin. Lê zebanî bi ser wan vî dihatin... Bi laşê sar bajar germ dibû. Çavên zarokan ên vekirî, li ser laşê sar diman. Dayik di bin diwaran de li ser axa sar dirêj dibûn.

**Tenê sê roj mabûn.** Li dora arê Zerdeşt, te dîlan bigirta, wekî zarokan li dora êgir govend bigeranda. Bi çepik û lîlandinê. Kalê Zerdeşt pir hez ji me kiriye ku, ar ji me re kiriye diyarî. De ka were emê têkevin kolanên û li dora êgir dîlanê bigirin û gazî der û cîranan jî bikin. Bêjin werin tevî şahiyê bibin. Em jî xwe bikin parçeyekî êgir, xwe bi êgir bişon.

**Tenê sê roj mabûn** Hevalo ji daweta mezin re! Ma tu çima ewqas dilezîni Hevalo! Ez

bawer im te dil heye, tu xwe bigihîni dîlanê û bibî sergovend. Tê bîra te Hevalo! Hevalên li ser eniya wan rengê kesk û sor û zer hebû, me bi destê hev digirt û li der û dor keş û xortan bi lîlandin û çepikan, bi dîlanên Amedê, ber bi def û zirneyê ve dikişyan. Wekî ku mirov bi eşqî here cengê û paşê dilgermiyek li mirovên li derdora me peyda bibe.

**Belê. Tenê sê roj mabûn.** Di kolanên Stenbolê de me hev wînda kir. Te xwe, wê şevê gihand dîlanê li welêt. Dîlana herî mezin li wê çêdibe. Lê şeva tu çûyî, sixûr hatin malê, her tiştê me li nav hev xistin. Gelek tiştên me dizîn. Tu zanî Hevalo! Ev karûbarê kal û bavê wan e. Ez ji te re dibêjim, haya te jê hebe. Lê tu xeberan ji te nagirim. Xebera ku ji te digirim, tenê xeberên di nava rûpelên rojnameyan de ne Hevalo!



● 16 avrêl 1992:

**Înstîtuya Kurdî hate damezirandin**

Înstîtuya Kurdî ji aliyê komek rewşenbîrên kurd ve roja 18'ê avrêla 1992'yan li Stenbolê hate damezirandin. Armanca damezirandina Înstîtuyê, bi awayekî zanyarî li ser dîrok, çand, huner, ziman û hwd. rawestîn bû. Koma damezirandina Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji van kesan pêk dihat: Musa Anter, Yaşar Kaya, Feqî Hüseyin Sağnıç, İsmail Beşikçi, Abdurrahman Dürre, İbrahim Gürbüz, Çemşit Bender û Süleyman İnanoglu.

**BÛYERINE JI DÎROKÊ**

● 22 avrêl:

**Roja Rojnamegeriya Kurdî**

Miqdat Mîthad Bedirxan cara yekemîn li Paytexta Misirê Qahîreyê rojnameyeke kurdî ya bi navê "Kurdistan" derxist. Piştî vê di sala 1908'an de, li Stenbolê ji aliyê Sureyya Bedirxan ve îcar kovareke bi navê "Kurdistan" hate weşandin. Di sala 1919'an de jî Muhammed Mihri Hilav li Stenbolê dîsa weşaneke bi navê "Kurdistan" derdixê. Roja 22'yê avrêlê ji ber ku cara yekemîn rojnameyeke bi kurdî hatiye weşandin, wekî Roja Rojnamegeriya Kurdî tê pîrozkirin.

**Salvegera PKDW'ê hate pîrozkirin:****Mîzgîniya****Kongreya Neteweyî**

Li pîrozbahîya salvegera PKDW'ê ya çaremîn, ji bilî endamên parlamentoyê şexsiyetên kurd ên wekî Celal Caf, Ekrem Caf, Aziz Mamlî, Nebil Hasan, Serçil Kazas, Mustafa Şalmaşin û hwd. jî amade bûn.

Parlamentoya Kurdistanê li Derveyî Welêt, çaremîn salvegera xwe bi resepsiyonekê li navenda avahiya xwe ya li Brükselê pîroz kir.


Serokê Konseya Revêberiya PKDW'ê û endamê Komîteya Amadekar a Kongreya Neteweyî, Zübeyir Aydar, Mizgîniya Kongreya Nataweyî da. Aydar raporên ku der barê xebatên ji bo Kongreya Neteweyî de hatibûn kirin, diyar kir.

Serokê Konseya PKDW'ê, Zübeyir Aydar di rapora ku xwend de wiha got: "Ez dibêjim xebatên me heta niha bi awayekî baş meşîyan. Hûn dizanin me diyar kiribû ku em dê roja 21'ê Adarê, kongreya xwe pêk bînin, lê ji ber bûyer û pêşveçûnên dawîn, ev biryar ji aliyê Komîteya Amadekar ve hate taloqkirin. Lê ez dixwazim îro vê mîzgîniyê bidim we ku Kongreya Neteweyî em dê di meha gulanê de, pêk bînin." Vê axaftina Aydar bala gelek beşdaran jî, kişande ser mijara Kongreya Neteweyî. Di civîna pêkhatî de herwiha hate diyarkirin ku pêwîst e kurd û kurdistanî bi rûmet û hêza saziyên xwe baş bizanibin.

Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya jî di destpêka axaftina xwe de salvegera PKDW'ê li hemû kurdistanîyan pîroz kir û wiha got: "Ji roja ku ev saziya kurdan li derveyî welêt hatiye damezirandin û heya îro her dem ji bo ku çareseriyê pîrgirêka Kurdistanê bi riyên siyasî were çareserkirin hewl da û hewldanên xwe bê rawestan didomîne. Lê tu carî jî hedefgirtina dewleta Tirk jî, rizgar nebûye. Hedefa Dewleta Tirk, herdem bûye MED TV, Parlamento û Öcalan."

Kaya di heman katê de bal kişand ser komploya navneteweyî ya li dijî Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan û li ser tîkiliyên Amrîka Îsraîl û Tirkiyeyê jî rawestiya.


Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya li ser xebatên rêxistin û saziyên kurdan jî rawestiya û dîtîna ramanên xwe der birin. Wî got ku di serî de parlamentoyê, ERNK, yekitiyên olî, gel, partiyên Bakur û platforma partiyên Başûr xebateke heja meşandin. Parlamento tevî 20 parlementerên



cihê xwe di nava meşa li Romayê de girt. Hatina Serok a Romayê, kurd û Kurdistan xistin rojeva cîhanê. Lê pêwîst e em ji bîr nekin ku piştî girtina Öcalan, di warê yekîtiyê de, gaveke giring hate avêtin. Li çar beşên Kurdistanê gel rabû ser piyan û nerazîbûna xwe ya li dijî girtina serok û komploya navneteweyî diyar kir. Tu kes nikare vê yekê wekî tiştêkî biçûk bibîne, ev jî bo pêkanîna Kongreya Neteweyî jî gava herî mezin e. Welatparêziyeke nû ye. Lewre em dibêjin bêaqilên ku dewleta tirkiye bi rêve dibin, gerek Öcalan bibira ser maseya aşiyê, nebira zindanê. Kaya di dawiyê axaftina xwe de, wiha got; "Li cîhanê hinek netewe hene hejmarê wan milyonek e, lê xwedî dewlet in. Çima em kurd 30-40 milyon in û li ser axa xwe dijîn, lê bê dewlet in. Ez dibêjim divê ji îro pêştir kurd xebata xwe ya çekdarî, siyasî û neteweyî ji her demê bêhtir di ber çavan re derbas bikin. Dawiya xebateke neteweyî, serxwebûn e azadî ye û serkeftin e."

Ji bilî endamên PKDW'ê şexsiyet û rêxistinên kurd jî, li pîrozbahîyê amade bûn. Kesên wekî Celal Caf, Ekrem Caf, Aziz Mamlî, Nebil Hasan, Serçil Kazas, Mustafa Şalmaşin û hwd. Piştî ku civîn bi dawî bû, xwarina ku ji aliyê PKDW'ê ve hatibû amadekirin ji mêvan û beşdaran re hate pêşkêşkirin.

Î.CAN DILBIRIN /BRUKSEL

**ÇAVDÊRÎ****Agir şûna xwe dişewitîne**

SERKAN BRÛSK

Kosova, navçeyek otonom a Yugoslavîyaya kevn e. Di dema Tîto de gelên Yugoslavîyê wekî dewleteke federe di nava hev de bi aşî û xweşî dijiyan. Tîto ev yek bi dirêjahîya salan pêk anî. Çi qewimî, piştî mirina wî qewimî. Ji nişka ve ew gelên ku di nava aşî û xweşiyê de dijiyan di navbera nîr û klebiyan de li hevdû nêrîn. Hêdî hêdî ava serê hevdu germ kirin. Û dawîya dawî jî tîrbên hevdu kolan.

Dema mirov li rewşa dawî ya Yugoslavîyê temaşê dike, mirov dîmenên pîralî ku hemû aliyên wê dişewitin dibîne. Bi deh hezaran mirovî di nava çend saetan de dev ji mal û milk, gund û bajarên xwe berda û berê xwe dan welatên xerîb. Di nava çend rojan de bi milyonan mirovî xwe li sînoran da, hejmarek mezin hîna jî, li ber tîlan in û hejmareke din jî, derketine derve.

Dîsa wekî ku di hemû şeran de pêk tê, êşa herî mezin dibe ya zarokan. Zarokên bê gune di vê temenbiçûkiya xwe de dikevin ber şapa xezabê. Berî her tiştî û her kesî ew tîne telefîkirin. Ji bo vê yekê jî, ne cûdahîya mekanî û ne jî, cûdahîya nîjadî ferq dike. Agirê ku tê pêxistin berî herkesî zarokan, di pey wan re jî, kal, pîr û jinan dişewitîne.

Û agir bi berdewamî dişewitîne. Agir heman êşê li şûna xwe dihêle. Ne li rengê çerm dinêre, ne li nasnameya cûda dihîshise û ne jî, li feqîr û dewlemendan dinêre.

Agir hucreyên sînîrê mirovan bi heman êşê bar dike û bi ser mêjî de mîna fuzeyên kuştinê dişîne. Ev şaneyên bi êşê barkirî bê navber mêjî bombebaran dikin.

Ev agir bedena girseyên bîndest bi êşê bar dike. Xwe li koka wan asê dike da ku wan ji kokê ve biqelîne.

Agir dewsa xwe dişewitîne.

Te divê ev agir ew agirê ku çar hezar gund û bi sedan mezrayên Kurdistanê şewitandibe, bi milyonan kurd sirgûnî Tirkiyeyê kiribe û ji wir jî, li cîhanê belav kiribe, te divê ev agir ew agir be ku bi dohnê çermê reşikan hatibe pêxistin, te divê ev agir ew agir be ku almanan îsraîlî pê birajtibin, te divê ev agir ew agir be ku îsraîlî di nava piyên filistîniyan de pêdixin, te divê ev agir ew agir be ku berdide pey kosovayîyan û te divê jî, ev agir ew agir be ku bi ser serê sirbiyan de dibare, ev agir ew agir e, şîrê ku mirovahiyê ji çîçikên diya xwe mêtîye wek xwîn di pozê mirovahiyê re tîne.

Em di çapemeniya cîhanê de li dîmenan temaşê dikin. Li dengên bombeyên kuştinê guhdarî dikin. Em li agirê ku keda mirovan dişewitîne, li hilweşandina berhemên bedew temaşê dikin ku bi destên hunermendan hatine çekirin, em di nava agir de dengên "dayê" dibihîzin, em hewara dayikan dibihîzin, em di nava van dîmenan de dengê hewara zarokên Kurdistanê dibihîzin.

Em li leyistika hûtên diltenik temaşê dikin, bê ku em êşê Helebce, Serdeşt û bi hezaran koçberên Bakur ji bîra bikin. Em li leyistika Xwedayên xerabîyan temaşê dikin, di rola ferîştayên azadkar de.



Hunermend Hekîm Sefkan:

## Wêjeya herî bilind str

HEVPEYVÎN: SERKAN BRÛSK

**Ç**ima helbest lê ne beşek din ji ya edebiyatê?

✓ Berî her tiştî ez ji malbateke dîndar tîm. Navê bav û apên min, bêyî rengdêra meletiyê nayê hildan. Wekî din jî hema bêje hemû endamên malbatê bi awayekî amator jî be, têkiliya wan bi şaxek ji şaxên hunerî re heye.

Çima helbest? Behremendiya(kabiliyet) min, ez ber bi helbestê ve kişandim. Wê ev şax hilbijart, min jî da pey wê. Min behs kir ku hîna di zaroktiyê de danûstandina min, hema bêje bi hemû şaxên hunerê re çêbûn lê min ji nava wan helbest hilbijart.

**Dema te dest bi helbestê kir, tu bi zehmetiyên çawa re rû bi rû mayî?**


✓ Ji bo mirovekî dinivîse jêderk ango çavkanî berî hertiştî tê. Jêderk, ji bo nivîsandina helbesta kurdî pir kêma e. Rast e, mirov dikare gelek nava bihejmêre; di serî de Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj û hwd. Lê dîsa jî berdeyamî tune ye. Qutbûnek, ku deh salan berdeyam dike, di navbera helbestvanan de heye. Ji ber vê jî nûbûnek nehatiye pê. Cegerxwîn li şûna "Selwa û Xwedê" "Kurd û Kurdistan" gotiye. Yanî tişteke nû neafirandiyê. Bi gumana min, ne tenê ez, herkes di warê jêderkê de tengasiyê dikêşîne. Edebiyata me ya herî bilind, ku ez bi xwe nixekî pir bilind didim wê, stranên klasîk in. Mirov jiyana kurdan a resen, bi hemû aliyên wê, di van stranên de dibîne. Wekî din jî, ez li gundan li ber çîrokên mezin bûm. Min ji pirtûkên bavê xwe yê dîni kelêke mezin wergirt. Jêderka min ev bûn. Bêguman ev dema ku em tê de dijîn jî, di meseleya kurd û Kurdistanê de alîkariyê mezin da min. Lê di warê edebiyatê de û bi taybetî jî di meseleya helbestê de, min xwe bi edebiyata devkî ya kevn xwedî kir.

**Temaya hevbeş a helbest û besteyên te welatparêzî û şoreşgerî ye. Welatparêziyêke serhildêr. Çima serhildan?**

✓ Ma di jiyana me de tiştêkî em qebûl bikin heye? Ne evîna me evîn e, ne jiyana me jiyana e, ne misilmanên me misilman in, ne komunistên me komînîst in, ne dostên me dost in û ne jî dijminên me wek yê xelkê ne. Yanî tiştêkî ku tu qebûl bikî di vê civakê de tune ye. Tenê riyek ji me re dimîne: Îsyana!

**Lê îsyana te ya gel e. Li her çar parçên Kurdistanê kurd helbestên te fêmkirin. Di vê wateyê de H. Sefkan sînorê gundê xwe derbas kiriye, bûye endamê Kurdistanê mezin?**

✓ Di nêrîna min de kurdek nemaye ku



Hekîm Sefkan "jokêrê" çand û hunera kurdî ye. Wî, heya îro pexşan, senaryo, kurteçîrok û helbest nivîsîne. Digel vê ew karê stranbêjî û bestekariyê dike.

min ew nasnekiriyê. Bila ev gotina min şaş neyê fêmkirin. Mebesta min ji vê peyvê ev e; ku min bi gelemperî têkilî bi endamên hemû kategoriyên civakê re danîye. Ez bi mehan li Asyaya Navîn, li Qefqasiya mame. Ev bi salan e, ku ez di nava kurdên bakur de me. Jixwe ji Başûrê Biçûk im, dîsa têkiliya min ji kevn de bi Başûrê Mezîna re heye. Ez dikarim bêjim ku min bi giştî derd û êşa kurdan ji nêzîk ve nas kiriyê. Li vir tiştê herî muhîm di nivîsîn min de jiyana gel e. Ez tiştên dûrî jiyana Heso û Fatê nanivîsim. Çimkî ez yekî ji wan im. Tiştên ku ez dibînim, ew jî dibînin. Ha dibe ku ez berî wan û bi awayekî din dibêjim û dinivîsim. Li vir tenê awayê gotinê û nivîsandinê yê min in, wekî din tiştêkî min tê de tune ye. Dîsa ji ber ku ez ji vê civakê me, ez ji vî awayê gotinê hez dikim.

**Ez jî di helbestên te de kêrhatiyêke zela dibînim. Wisa xuya ye aliyekî din ê serkeftinê stranbêjiya te ye. Tu bi sedan stranên kurdî ji ber dîzanî. Di vê serkeftinê de rola vê yekê çi ye?**

✓ Têvî ku ez bi xwe distirêmin jî, ez ne stranbêj im. Ev aliyekî meseleyê. Ya din. Gelek kes navê muzîka hemdemî li stranên ku ez çêdikim dikin. Hinek jî, navê wê datînin muzîka taybet. Lê ez îdî dikim ku min li muzîka kurdî ya klasîk guhdarî kiriyê. Ji ber ku ez bi wan stranan

mezin bûme. Jêderka wêneyên min klasîkên kevn in. Min gelek caran ev gotiye û min nimûneyên wê jî dane. Niha jî dikarim nimûneyan bidim. Strana kurdî ya klasîk di heman demê de romanekê nenivîsandî ye, bi devkî ye. Dîsa film e, lê di vê berhemê de ne deh kes, tenê yek du kes hemû hestan dibêjin. Ji ber vê yekê wêne gelek û dewlemend in. Kî dixwaze wêneyan nas bike, bila here li Êmûşa Hemo guhdarî bike, bila here li Şêx Evdî guhdarî bike, bila biçe li sedan stranên klasîk guhdarî bike. Ez dixwazim du nimûneyan ji wan wêneyan bidim. Dema lawîkê kurmanc li Çiyayê Kirmênc dibêje; "Dema ez mirim û piştî min jî kubara min mir, tirba me herdû ciwanan li kêleka hev bikoşin. Qulekê di navbera herdû tirban de vekin, destê min yê rastê di bin serê dela kubarkin û yê çepê di navbera dil û kefenê şil kin."

**Zimanekî zelal û mesajêke pir xurt.**

✓ Ha di klasîka kurdî de wêneyên wisa hene. Helbet ger te ev stran nebîstîbe, diyar e helbesta tu binivîsî wê ne helbesta kurdî be. Divê jêderka edebiyata me ev be. Tiştêkî me ji van berhemên pê ve tune. Niha em ne mîna Rûsan in. Çernîşevskî, Puşkîn, Gorkî û Mayakovskiyên me tune ne. Van mirovên wisa mezin berhem dane destên hevdu. Mesela tu li ereban dinihêrî, dîsa dîrokek dîr û dirêj ya

□ Hekîm Sefkan, di sala 1968'an de li Amûdê li başûrê Kurdistanê hatiye dinyayê. Li Înstîtûtiya Pedagojiyê ya li Qamişloyê du salan dixwîne. Di vê demê de dest bi karê şanogariyê dike. Demêke kurt be jî, ew di şanoya bajêr de difêze. Piştê şanoyek kurdî ava dike. Sêçar salan li Qamişloyê xebata xwe ya hunerî berdeyam dike. Di vê demê de jî, bala H. Sefkan bêtir li ser helbestê ye.

Ew, sala 1990'î tevî şoreşê dibe û dawîya heman salê jî derbasî Ewropayê dibe. Li vir di nava Hunerkomê de xebata xwe ya hunerî û edebî bînavber didomîne. Peyre ew sê salan li Sovyeta kevn dimîne. Li wir jî ew karûbarê hunerî digêrîne. Gelek bernameyan ji bo Med TV amade dike. Piştî sê salên li Rûsyayê, ew derbasî Med tv dibe û niha jî ew di heman saziyê de karê xwe yê hunerî û çandî berdeyam dike.

Hekîm Sefkan, xwedî pirtûke bi navê "Bîstîkek Tije Sal" e û li kêleka vê pirtûkê kasetek wî ya bi navê "Zarokên Deştê" heye.

nivîsandinê heye. Yê me çend berhemên heja dane destên hevdu? Em behsa Ehmedê Xanê dikin lê ji bo miletekî ev ne tiştêk e. Wekî din jî, pêşiyên me ji bo me tu berhemên nivîskî nehiştine.

**Tu dikarî hinekî jî, behsa aliyên xwe yê afirineriyê bikî. Îlham, neçîrvaniya pêjnan û gera li bedewiyan, ev li cem te çawa ne?**

✓ Ger ev bi te re tune bin, tu nikarî binivîsî. Mesela îlhama li cem min, ne seata wê, ne cihê wê, ne bihara wê ne havîna wê diyar e. Ew mêvaneke bêdawet e.

Ya duyemîn tu ne evîndar bî, tu nikarî binivîsî. Mirovên aşiq xwedî hest û pêjnên kûr in. Bi gumana min ji ber ku em ne aşiq in, helbestên me jî jar û qels in. Li vir mebesta min ne evîna ku, di navbera xort û keçan de derbas dibe ye. Feqiyê Teyran aşiqê teyrana û avê bû. Di folklorê kurdan de heye, mirovek evîndarê çavên beqê dibe. Heft salan her serê her sibehê, ji mala xwe derdikeve, da ku li serçavê beqê temaşê bike. Hinek dibin evîdarên Xwedê. Mesela Nehsan heye. Ji bo Xwedê bibîne û nêzîkî wî be, stûnek dirêj çêkiriye. Ji bo destava xwe jî li wir bike, qulek di nivê giroveriya stûnê de vekiriyê û li wir rûniştîye.

Bi taybetî em ên ku li derveyî welêt in, ji ber ku evîndariyêke wisa mezin bi me re tune ye, em nikarin berhemên mezin ji afirîn.

**Te behsa qelsiya eşqa hunermendên li derveyî welêt kir. Bêrî û hesreta tiştên ku**



# ...a klasîk e

mirov kirine mirov, her ku diçe dibe mî-  
xengereke sor, di ser dilê mirov de. Ev  
hestên kûrtir li cem hunermend çêdi-  
n. Lê çima berevajîya vê li cem huner-  
mendên kurdan heye?

✓ Di vê ez vê jî bêjim ku şairên kurd  
kêm in. Ev rastîyeke me ye. Li aliyê din  
gelek hunermend bi derketina derve re  
ziwa bûne. Ez dibêjim ji ber ku eşqa wan  
bû, ew zû ziwa bûn. Kesên xwedî e-  
men mezîn, li ser heyvê bin jî, ew dê di-  
so bafirîn. Bi raya min ji bo mirov bibe  
şairêkî/e baş, divê mirov di dijwariyên  
dijwar re derbas bûbe. Mirov hatibe gir-  
zîn, li ber xwe dabe, zilm dîtibe, bi darê  
zêrê sirgûn bûbe, xwedî hesreke pêkne-  
tî be û hwd. Serpêhatiyên bi vî rengî  
helbestvan dikemilînin.

Ya duyemîn, ji bo mirovekî xwedî evî-  
nek mezin, mekan ne gelekî girîng e. Mi-  
rovek dikare di kozik û çeperên şer de ne-  
lê mirovek dikare li kolanek ji kolanên  
metropolan hemû giraniya şer bijî. Hel-  
best ruh e. Ruh jî helbest e.

Tu dizanî peyv, ji bo şair cewherê me-  
lê ye. Peyva kurdî têra wênekirina  
ruhê kurdan dike?

✓ Ezê nimûneyekê bidim. Zimanê er-  
menîyan bi serê xwe komek e. Dîsa jî, şa-  
irên ermenîyan pir baş dinivîsin. Niha em  
dikarin ji gelek zimanan peyvyan bistînin,  
lê yê ermenîyan tenê bi serê xwe ye û li vî  
gorê jî teng e: Di helbestê de ya muhîm ev  
şair çiqasî dikare bi hindik peyvyan ge-  
lek wêneyên bi wate û kûr çêke. Niha ez  
gelek helbest û gotaran ji serî heta binê  
wan dixwînim lê ez nizanim bê ev nivîs-  
kar dixwazin çî bêjin. Bi rastî heyfa wan  
gotinan e. Ez bi xwe mereq dikim, gelo  
nivîskarê me bi xwe ji wan gotinên xwe  
fêhm dike an na?

Di nava helbestvanê me kurd de nex-  
weşiyek peyda bûye, bêtîr ku li peyvên  
kurdî bigerin wan ji ber xwe ve çêdikin.  
Mesela peyva "derzî" heye lê ew dibêje  
"sertûjîk." Ev jî çî têt? Ev jî vî têt ku hel-  
bestvan bi zimanê dinivîse nizane. Niha  
ez gelek helbestên helbestvanên Bakur  
dixwînim, ez ji wan tiştekî fêhm nakim.  
Gelo ew tenê ji bo xwe dinivîsin an ji bo  
peyvên qelew nivîsî, ev dibe malxerabûn.  
Çimkî peyv ji bo helbestê ye, ne helbest ji  
bo peyvê ye.

Dema tu van helbestan dinivîsî, hes-  
tên çawa li te peyda dibin? Bi taybetî de-  
ma te "Nûrhaq" nivîsî, di cihana te ya  
nîxumandî de çî qewimîn?

✓ Min Hevalê Şêxo Dîrlîk (Sebrî) pir  
ji nêzik ve nas dikir. Wekî din jî, berî ku  
ew îxaneta li Eyaleta Tolhildanê derkeve,  
min gelek caran ji hevalan re digot, li vir  
nîştine ne li rê diqewimin, gelek heval li  
herême şêhdî dikevin. Bi vî rengî min

hestên xwe derdibirin. Piştî demeke kin  
Hevalê Sebrî derbasî eyaletê bû. Dema  
min nûçeyê şhadeta wî bihîst, min rahîst  
pênûsê. Heta dawîya helbestê nehat, min  
nekarî pênûsê ji destê xwe berdim. Jixwe  
helbestên min ên herî serkeftî yên ku min  
bi vî rengî nivîsandine ne. Çimkî di vî  
demê de çî di dilê min de heye, ez wê di-  
rijînim ser kaxizê. Di dema ku ez hel-  
bestên bi vî rengî dinivîsim de, ez di ber  
helbestên xwe re digirîm û di vî demê de  
ez ne li cihana maddî me. Mesela carekê  
dema min ev helbest dixwend, dilê min  
êşîya ez ketim. Ew tê bîra min.

Berhemên H. Sefkan çiqasî mohra  
zaroktiya wî hildigirin?

✓ Cihana herî paqij û zelal a zaroktiyê  
ye. Xeyalên mirov pir in. Tu di nava kêlî-  
yekê de malekê ava dikî, piştî kêlîyeke  
din tu ji wê aciz dibî wê xera dikî. Ji bo  
zarokan cihan bêsînor e. Mesela helbesta  
min vî dawiyê nivîsandiyê, "Xewnên Za-  
roktiyê". Yan jî, "Em Zarokên Deştê ne."  
Bi xêra helbestên xwe ez gelek caran  
xweziya xwe bi zaroktiya xwe tînim.  
Xwezka ez mezin nebûma. Ez dixwazim  
hemû aliyên zaroktiya xwe di hişê xwe de  
ronî bikim. Tu zanî di zaroktiyê de qede-  
xe tune ye. Tu di xeyala xwe de pir tiştan  
çêdikî. Tu ji bo tu tiştekî keleşan li pêşîya  
xeyalên xwe ava nakî. Di mezinahiyê de  
mîrov keleşan bi dilê xwe, li pêşîya xe-  
yalên xwe ava dike. Tu dixwazî tiştekî bi-  
kî, xwe bi xwe dibêjî, ev nabe.

Têlên bi strî ji aliyê Kurdistanê heta  
bi aliyê din di dilê wê de hatine çikandin.  
Ez dizanim strîyên têlan zaroktiya te jî  
dirîne. Di helbestên te de dewsa van  
strîyên hesînî çiqasî kûr e?

✓ Te di destpêkê de behsa îsyane kirî-  
bû. Min jî gotibû tiştek tune ye di jiyana  
me de, ku em jê hez bikin. Tenê kêfa me  
ji vî şerî re têt, ku em dixwazin pê jiyane-  
ke azad bi dest bixînin. Mebesta min jî şer  
hemû xebatên ku berê wan li azadiya  
welêt e. Ez dikarim bêjim tenê ev xebat ya  
me ye, ya na tu tiştekî me yê din tune ye.  
Sînor wekî xincerekê di ser dilê mirov de  
ye. Ma mirov çawa dikare îdare bike? Bi  
gumana min sînor xengêr e. Dîsa ew rû-  
niştina diya min ya li ber dîwêr û ew a-  
wirên wê yên di Keleşa Mêrdîne de zîq  
mayî... Wê demê min tu mane nedidayê,  
bê ew çima wisa disekine û hêstiran diba-  
rîne. Lê wê rewşê di dilê min de gelek tişt  
dinivîsin. Jixwe her rojên cejnan dema em  
diçûn ber wan têlan...

Me ji wan rojan re digot "gorişme."  
Me nizanî bê ev peyv têt çî wateyê. Helbet  
ev hemû bûyerên dîrokî ne, ku şopên xwe  
di dilê min de hiştine. Ez bawer dikim ro-  
la sînor li ser nivîskariya hemû hevalên  
min yên Amudî heye. Dibe yek ji sebaan  
ev be ku evqas nivîskar û hunermend ji A-  
mudê derketine.

## STRANEK TENÊ TÊRA DEMÊ NAKE...!

Tu wekî huner-  
mendekî ku  
stran li ser birêz  
Öcalan çêkirine, ku yek  
ji van stranan jî, "Me-  
zin apo, bilind apo, apê  
me" ye, dema te ew di-  
men dîtî tesîreke çawa  
li ser te çêbû?

✓ Serok berî ku dil  
bîkeve, destê dijmin hi-  
nekî em ji bo bûyerên  
bi vî rengî amade diki-  
rin. Wî gelek caran go-  
tina "bêmin" bi kar anî-  
bû. Helbet ev ji mezi-  
nahî û dûrebîniya wî dihat. Bi gumana  
min mîna her kurdekî dilsoz du tesîr li  
min bûn. Yek aliyê hestiyarî. Ez dikarim  
bêjim min nexwest wê kêlîkê ne ez kesî  
bibînim û ne jî kes min bibîne. Wê  
demê ez di cihana xwe ya taybetî de  
bûm. Tenê di wê cihanê de min dikarî-  
bû bijiyama. Cih ji kesî re tune bû.

Di warê siyasî de jî, nerfina min wiha  
ye. Serok ne îro bi salan e Serok Apo ji  
şexs derketibû. Ew sazî bû, îdeolojî bû.  
Niha ez dê mîsalekê kê bidim û ev mîsa-  
la ku ez dê niha bêjim jî, ez ji vî sazîyê  
fêr bûme: "Dibe tu di şer de bî, dibe ku  
tu car caran tiştên xwe yên herî bi nîrx  
jî wîndî bikî lê gereke tu baweriya xwe  
wîndî nekî, tu divê hedef û stratejiya  
xwe wîndî nekî. Ger te bawerî wîndî  
kir tu nema karî bigihî hedefa xwe."

Ez di dawî de dixwazim vî bêjim,  
girtina Serok ne mîna ya serokên klasîk  
e. Ji ber ku Serok ji me re fikir û îdeolo-  
jî hiştîye. Mesela îro ew dil e lê kar û  
xebata me deh qat bûye.


Wek peyva dawî jî çî mesaja te ji bo  
hunermendên kurdan heye û wekî din jî  
gelek galayên mezin ji bo azadiya Serok  
hatin sazîkirin ku tu bi xwe jî di hemûyan  
de wekî pêşkêşvan amade bûyî. Hinekî  
jî behsa van galayan bikî dê baş be.

✓ Bi rastî jî ez li Yewnanîstanê giri-  
yam. Min li ser vî galeyê hestên xwe ji  
rojnameyê re nivîsandin. Ez dixwazim  
vî bêjim; li hêlekê sê sed hezar mirov, ji  
bo te derdikevin, ew piştigiriya te dikin  
û li aliyê din jî hunermend. Bi raya min  
gel, hunermend li ber xwe birin. Li vir  
diyar bû ku hunermend ne serbixwe ye,  
ew girêdayî rewşê ne. Hunermendên  
yewnanî ev îspat kirin. Ew li kêleka  
gelê xwe sekinîbûn. Em bi huner-  
mendên yewnanî re peyvîn. Wan ji me  
re got ku heta niha hunermendên yew-  
nanî wisa nehatibûn cem hevdu. Cara

Baş e. Çî ferq di navbera helbestek  
normal û besteyekê de heye?

✓ Strana kurdî pir têt kopyekirin. Ev-  
qas têt kopyekirin ku ez gelek caran vî  
yekê dişibînim filmên hindîyan. Tekstên  
stranên me wisa bûne, tu li peyva pêşî di-  
nihêrî tu zanî bê ya dawî çî ye.

Rast e, min heta niha hejmareke pir  
mezin stran nivîsandine. Bi gumana min  
zehmetiya herî mezin ku di nivîsandina  
tekstan de têt kişandin, yekalîbûn e. Em  
tenê aliyekî dinivîsin ev jî me teng dike.



yekemîn dema ku tir-  
kan Qibris dagirikirin  
û îro ji bo azadiya Se-  
rok Apo. Bi rastî hes-  
tên pir cûda û xerîb bi  
mîrov re çêdibûn.

Galaya li Swêdê jî  
çêbû, bi heman rengî  
bû. Tu zanî bi salan e,  
hinek kes dixwazin  
kurdan li ber çavên  
Swêdiyan reş bikin.  
Lê dîsa jî, artistên  
swêd ên herî navdar  
beşdarî vî galayê bûn.

Hunermendên kurd  
jî, ji ber vî rewşa da-

wî gelek êşîyan. Tu ji bo hunermendên  
kurd çî dibêjî? Divê ew xwedî helweste-  
ke çawa bin?

✓ Rast e. Hemû hunermendên kurd  
bi rastî jî, gelek êşîyan û heta mirov di-  
kare bêje ku helwestê wan bi giştî baş  
bû. Beşdarî şevan bûn, cih bi cih ketin  
nava gel. Dîsa di şevan de striyan. Stran  
li ser Serok gotin. Niha me jî kaseteke  
marşan li ser Serok amade kiriye. Ew dê  
di deme nêzik de derkeve piyaseyê. Dî-  
sa gelek hevalan alîkariya me kirin.  
Xwestin hêza xwe di ser ya me xî. Îro  
ne roja ku mirov piştî xwe bide rewşê.  
Gotina min a dawî, stranek tenê têra  
demê nake.

Îro jî, li bakurê Kurdistanê tevgera  
xurt heye. Di encama têkoşîna Tevgera  
Azadiyê de em dibînin zaravayên kur-  
mancî û zazakî dane xwe. Lewre li ba-  
kur jî pêşketineke wêjeyî li dar e. Tu  
berhemên ku bakurî dinivîsin çawa di-  
bînî?

✓ Ez bi xwe ne zimanzan im. Têkili-  
ya min di çarçoveya helbestê de bi zi-  
man re heye, ne bi awayekî ilmî. Rast e.  
Piştî vî tevgera nûjen, gelek kes dinivî-  
sin lê şaşiyên pir mezin jî dikin. Mirov  
vî di helbest û pexşanê de dibîne. Ev jî  
talûkeye mezin ligel xwe tîne. Wekî din  
jî, çapemenî û masmedya jî li devera ku  
zimanê kurdî herî qels e, li bakurê  
welêt, dest pê kir. Med TV, rojname û  
gelek kovarên ku bi gelemperî belav di-  
bin, di destên bakuriyan de ne. Ev jî tra-  
jediyek e. Gelek caran mirov li hinek  
hevokan ras têt ku tu eleqeya wan bi za-  
ravayê kurmançî re tune ye.

Lê mirov divê vî înkâr neke ku van  
salên dawî zaravayê kurmançî qevzên  
dîrokî avêtine. Mirov dikare bêje ku za-  
ravayê kurmançî û kirdkî (zazakî) biha-  
xwe dijîn.

Ya duyemîn jî, kî straye yan jî li tem-  
bûrê daye, hewldaye ku gotinên stranên  
xwe jî bi xwe çêbike. Loma jî, qîmeta  
stranê namîne. Piraniya van kesan baş bi  
kurdî nizanim. Teknîka nivîsandina bes-  
teyê nizanim. Ev jî tadeyê gelekî mezin  
digihîne strana kurdî. Ez bi xwe jî li ser  
şoreşê dinivîsim. Lê di heman demê de  
dema ez helbestên li ser hezkirina civak û  
xwezayê dinivîsim, heta ji min têt dixwa-  
zim heqê wê bidim wê. Mesela Zîna ku  
Ciwan Haco distre evîni ye.



# Helbestin ji germahiya nanê sêlê



## Çar Çarîn

Ez û tu çar pênûs in  
Heke kaxiz tunebe  
Wê tenêti bibe barê me  
Bila agahiya te hebe

Ez û tu çar felqe ne  
Heke yekîti tunebe  
Wê cihêbûn bibe arê me  
Bila peyama te hebe

Ez û ta çar daristan in  
Heke ax tunebe  
Wê kurm bikevin darê me  
Bila xebera te hebe

Ez û tu çar dansal in  
Heke Agir tunebe  
Wê Newroz bixeyide ji bihara me  
Bila haya te hebe

İLHAMİ ÖZER

## Dilana Azadiyê

Ku ez mirim  
Min bi ava baranê bişon  
Qevdek gulên sor  
û kulmek ji berfa Agirî  
têxin paşila min

Min bi cilan ve veşêrin  
Kefen li min nekin  
li pala gund  
li pêşberî malan min veşêrin

Berfê bihele  
Gulê di gora min de şin werin  
Dema welat rizgar bû

Min pê bihesînin  
Da ku ez jî bi we re werim  
Dilana azadiyê

## Lete

Zere tenika min a kewayine  
Ayseno  
Çimanê to yê bereqayan ra  
Laserê hezkerdişî herekêno  
Ez zana

Ti  
Min ra zaf hez kena. Zaf  
Nêwazena  
Hendêk zaf min ra hez kerê  
(Meheredî ha)

Vila ke, vila ke  
Hezkerdişê xo yo esmanin vila ke  
Na kevza kera wa zeleqiyawa  
Na vilika sure  
Na mîrçika kulî fek de bena halînê xo  
Boya areqê nê paleyî ra  
û pêro dinya ra hez bike  
Ke ti pêro ra hez kerê  
Go parê min zî bibo te de  
Bizane  
Ez zî yew lete wa pêro ra  
Yew lete...

ROŞAN LEZGÎN

## Sînor

Ez hatim girtin...  
Mîna çêlikeke ku bifire  
Têkeve devê kûçikekî devgirêz

Ez hatim girtin...  
Mîna mirovekî ji serşokê  
Derketî

Şîfûtazî  
Ez hatim girtin...  
Ji sêla sor  
Dema revandina nanê şikeva  
Di destê diya xwe de

"Hate kuştin...  
Li ser sînorekî serxet  
Ku dilê wî yek"

ŞEXMÛS SEFER

## Zarokên Pale

Li ser rû tamariya spêdê  
di dil de eş û jana salan  
bi lez û bez  
dibihurîn şev  
ber bi zeviyên ve pembûwê  
keçiken hê ne xama.  
Hevalên we  
di dibistanan de pênûs digirin  
xwendin û nivîsandinê hîn dibin  
têra xwe zarokiya xwe dijîn.

Li jor  
tavek mêjî dikelîne  
rê nade dest zêde bixebite  
stiyên giya bêbext û  
hesreta azadiyê  
dilê dê û bav dihelîne.  
Her êvar  
bi çavên ku xew jê difûre  
bi hinarîkên kizirî  
dizivirin ber bi mal  
paleyên pembuwê.

Hûn hay jê tunebin jî  
xem û kulên we dirêse her tim  
ew dilê navser e  
û her gepa nanê ku dixwe  
an serê xwe datîne  
ser balgîvê  
spasîyên xwe dişîne  
ji keda we re.

BERKEN BEREH

## Mirina Reş

Ceng e  
Ên ku nikarin bibin dêw  
dibin kurm  
û  
bi birînê dikevin

Ceng e  
Her teneyek ax  
gulekê dihevwîne  
li welatê me  
BOTAN

Werin em biçin Botan  
şev wergeriyane rojan  
Her gulek dastanek  
Gul bişkivîn bi hezaran  
Ew  
Wa ye ew hatin dîsa  
Sorgulên serê çiyê

CÎHAN RO



Navenda Çanda Mezopotamya ya li Îzmirê

● 17.04.99 şemf:

Konsera Koma Şengal "Agirê Tolhildanê", saet:17.00

● 18.04.99 yekşem: Ji ber hîlbijartîne vê rojê sazî girtî ye. YÇKM

● 17.04.99 şemf: Filmê Kevin Kostner 'Bi guran re reqs', saet:16.00

● 18.04.99 yekşem: Filmê Bernardo Bertolucci 'Împaratorê Dawîn', saet:17.00

● 21.04.99 çarşem: Filmê Halit Refiğ 'Qowûşa Jinan', saet:19.00

## CALAKIYÊN HEFTEYÎ



Beksav

● 17.04.99 şemf: Filmê Costa Gavras "Bajarê Delodîn", saet:14.00

Gotûbêj: 'Programa jinûve avakirina împeryalizmê û Tirkiye'

Halil Nabiler, Suat Parlar, Sedat Şenoğlu, saet:18.00

● 18.04.99 yekşem: Gotûbêja li ser Tiyatroya Hemdem

Ali Berktaş, saet:14.30

Filmê Steven Spielberg 'Salên Şirîkî', saet:15.30

Konsera Koma Birol 'Muzîka Gelê Laz', saet:18.00

● 21.04.99 în: Filmê Steven Spielberg 'Salên Şirîkî', saet:15.30

Ligel kutabûna 21 rojan, MED-TV hîn jî venebûye

# Qerarê sînor derbas kir



Te vî ku ce-zaya li ser

MED-TV'yê hatibû birîn qediya, hîn jî televizyonê dest bi weşana xwe nekiriye. Cezaya girtîne ya 21 rojan, ku ji aliyê Komîsyona Televîzyonê ya Serbixwe ya Îngilistanê (ITC) ve bo MED TV hatibû dayîn, roja 12'ê avrêlê bi dawî bû lê televizyona kurdan MED-TV hîn jî nikare dest bi weşana xwe bike. Ji bo ku dest pê bike, divê ji aliyê heyeta weşanê ya ITC'yê ve biryar bê dayîn.

Rayedarên MED-TV diyar kir ku wan dosyaya xwe ya parastîne pêşkêşî rayedarên ITC'yê kiriye û ji bo destpêkirina weşanê li benda biryara ITC'yê ne. Dîsa li gorî gotinên rayedarên MED-TV'yê di hefteya pêşiya me de dê biryara li ser weşanên wê diyar bibe. Sa-zûmankarê MED-TV'yê Hikmet Tabak da zanîn ku wan bi rayedarên ITC'yê civînek pêk anîye û civîn bi awayekî erênî çûye serî, lewre jî ew hêvî dikin ku dê ITC der barê MED-TV'yê de biryareke erênî bide.

## Çalakiya li ber ITC bi dawî bû

Çalakiya grevê ya li ber avahiya ITC'yê roja 12'ê avrêlê bi dawî bû. Wekî tê zanîn piştî ku weşanên MED TV ji aliyê Komîsyona Televîzyonê ya Serbixwe ya Îngiltere ve bi qasî 21 rojan hatibû girtin, ji bo protestokirina vê, ji aliyê rojnameger û rewşenbîrên kurd yê wekî Günay Aslan, Eyüp Burç, Burhan Karadeniz û hwd. ve greva birçibûnê hatibû destpêkirin.

Kurdistanîyên ku dawî li çalakiya xwe anî,



Mehmet Karademir

Derbas bûn dem û dewran  
lê derbas nebû ew hesret û evîn  
û kêliyêkê jî neçû ji ber çavan,  
ew sûret û ew ken.

Roja 8'ê avrêla 1997'an dilê ku têra her kesî dikir,  
têra wî nekir. Ji ber nexweşîna dil emeliyat bû û bi  
emeliyatê ji nav me bar ki

Em te ji bîr nakin!

LI SER NAVÊ HEVALÊN WÎ BAHATTIN

diyar kir ku ew li benda diyarbûna biryara ITC'yê ne. Kurdistanîyan ji rayedarên

ITC'yê xwest ku ew destûr bidin weşanên MED-TV'ya ku televizyona gelekî ku serjimara wî 40 milyon e.

## Televîzyona nûçeyên rast û alternatîf

Kurdistanîyên ku çalakiya xwe bi awayekî bêdeng qedand, li ber Mala Gel a li Londrayê bi awayekî girseyî daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de Kurdistanîyan bal kişand ser girîngiya MED-TV'yê û wiha got: "Mafê kurdan e agahîstandîne heye. Deverên ku çapemeniya tirkan nakevê û nûçeyên ku çapemeniya tirk nade, MED-TV dide. Di axaftîne de hate diyarkirin ku wê gelê kurd û dostên wî her tim pêjînkir bin û ji saziyên navneteweyî yê ku aligirê mafê derbirina ramana azad in hate xwestin ku ew jî pêjînkir bin.


Greva birçibûnê ku li ber avahiya ITC'yê ve pêk hat, di pêvajoya 21 rojan de ji aliyê gelek kesên pêşverû û saziyên Îngilistanê ve hate destekirin û ziyaretîkirin. Yekîtiya Rojnamegerên Kurd (YRK) jî kete grevê û piştgirî da beşdarên çalakiyê.

Wekî tê zanîn ekranên MED TV ji aliyê Komîsyona Serbixwe ya Televîzyonê ITC'ya Îngilistanê ve roja 22'ê adarê bi qasî 21 rojan hatibû tarîkirin. Li gorî îdiaya komîsyona serbixwe MED TV bi weşanên xwe gel handana şer û tundrawiyê dikir. Lê rayedarên MED-TV'yê biryar wekî biryareke siyasî bi nav kiribû û dabû zanîn ku tiliya dewleta tirk û Amerîkayê di vî karî de heye.

NAVENDA NÛÇEYAN

## TÎŞK

# Weçîntene û kulturê daye



LERZAN JANDÎL

W eçîntene/seçim hêni ebi zenbîn asmên ra nêyame serê hardî. Sebeta ke kesî bişikiyê, seba îdarekerdena xo kesanê binan biçinêwe, ebi hezar serran lecî ameyî kerdene, zaf kesan na raye de sareyê xo dayî, zaf canî ginayî wele ro. La belê peyniya nê lecan de heqa weçîntene nasibê her kesî nêbiye. Verende na heqa biyê para dewletîyan, biyê para kesanê ke cemat ra tene cor vîndênê. Bado şaranê bindestan heqa weçîntene gurete, yanê cemêrdan pêrine û tewr pêyniye de jî cênîyan heqa weçîntene gurete.

Sebata ke seba na heqa kesan zaf lecî kerdê, manaya na weçîntene jî, kulturê na weçîntene jî seba dewletan, şaran û kesan zaf muhîm a, ebi qedr û qîmet a. Dewletan û şaranê binan de weçîntene û kulturê daye zê/sey dewleta tirkî, zê şarê tirkî niya. Çimke Tirkiye de na heqa serdestan da şarî û serdestî na heqe! seke bêro re îşê dînan, henî danê xabatnayene.

Ma na derqe de xeşim nimê. Yanê dewleta tirkî, sawcî û mahkemeyê daye, leşkeriya daye ebi kilmîyê înstîtûsiyonê daye pêro heqa weçîntene se danê xabatnayene ma rind zanîme. Hîle, dalavere, dek û dubare, zurre, îftîra, înkâr, zulim, zordariye, ruşvet/xûgî, ters û xof weçîntene de metodê dewleta tirkî yê. Yanê eke ewro sawcî Vural Savaş wazeno HADEP'ê bicêro, ma naye fam kenîme. Eke kesê HADEP'ê ênê guretene, îşkencan ra derbaz benê, aktîvîteyê daye ênê qedexekerdene mantiqê naye hete ra êno famkerdene, sebata ke nê angorê tabiatê koledariye yê. Her çîqa ke zafêriya şarê ma jî nê serranê peyena de manaya weçîntene, manaya xo îdarekerdene muso û wazeno ku angorê naye kesanê xo, partiyanê xo biçîno we, taye kesanê ma huna na rind fam nêkerda huna nêrêstê na zanayene.

Sere ra eşkera bî, ke weçîntene 18 Nîsane de di hetî estê. Heto yew/jû ebi pêraniya xo sîstem, yanê dewlete ebi kamçî nameyî beno wa bibo û heto bin de jî kurdî estê û kurdî binê HADEP'ê de êne humarnayene. Hetê teorî ra mordem şikîno hemverê naye bo. La belê pratîk de raştiya me na wa. Ma ha biwazîme ha mewazîme na raştiya û eke na tenê wariyê wîjdan û zanayenîme, gani ma angorê na raştiye hetê xo eşkera bikerîme.

Ciyatî û cudiyatîyî yew cemat de dewlemendî ya. Ez bi xo niya bawar kena û seba naye jî xebatîna. La belê cudiyatîyî/farklılıklar tenê deman de ganî pratîk de bêro eştene û yewtiye bêro avakerdene û erdem jî politîka zanayene û politîka kerdene jî na wa. Çi hêf o, ke ewroj welatê ma de taye cayan de taye kesî, ebi nameyê welatpareziye hewerê HADEP'ê de rê. Erê xo zaf bawar e. Baweriya xo, binê nameyê welatpareziye, roşnaviriye, ciyafikiriye, ere feodalîzmî, ere mordematiye, dewijitiye, înteresyanê qirejînan, îttifaqanê qîlêrinan anê. Sebata ke kayê qîlêrinî ênê kerdene, nê teyna kesê bêhetî wariyê nê kaya jî nêşikîne îradeya xo ya azade bidêre xebatnayene. O vano apê mi, o bin vano xalê mi, a bine vana derezayê mi, a bine vana aşira mi, e binî vanê dîne mi, e binî vanê dewa mî. Na ca de kes şikîni îradeyêde azade ra qese bikero? Bê guman nê! Ebi na qeyde îradeya şarê ma de jî êno kaykerden.

Na derheq de mîsalî zaf ê. La belê ez wazena, Gimjim de weçîntena reisê belediyeye zê yew nimuneyê bicêrî. Eke ma dîrokê ra derse gurete, ma ganî bizanîme Gimjim de manaya na weçîntene û nê kesan çik a!

Xêca HADEP'ê qedrê qe çiyê çîno! Manaya e binan pratîk de hetkariya dewleta, parçekerdene rayanê HADEP' a. Ma ganî naye mezgê xo ra bineqesnîme û ci ra dersan bicêrîme. Ebi çî sebeb beno bibo, nê çîyan weş mevinîme, mahkûm bikeme û ser de ji ci ra hesab bipersîme. No hesab wa na sate hêni rakerde bimano, la belê jî!

Zê her cayî, taybetiye jî Gimjim û cayanê binanê e Gimjimî de yew alternatîf esto, o jî HADEP a.



# Çûkê biçûk ê hêlîn xerabûyî

Çûkeke xweşik û biçûk li devereke avî û şneyî ku gulên renga reng lê şîn dibin, ji xwe re hêlînek çêkiriye. Li hêlîna xwe ya germ û nerm çêlîka xwe mezin dike. Çêlîkên xweşik jî bi şadî mezin dibin.

Lê rojekê sewaleke hov van bedewiyên çem dibîne tê vê derê. Ji cîk e cîka çêlîkan aciz dibe. Dawiya dawî qerara xwe dide ku here hêlînê xera bike û wan çêlîkên xweşik bikuje.

Ew sewalê hov êrîşî hêlînê dike û ligel hemû qîrîn û arînên dayîkê çêlîkên wê dikuje. Tenê çêlîkek ji wan xelas dibe.

Her wiha di vê rûbarê de gelek beqên xweşik jî hene. Ew bi waq e waq bi hev re diaxivin. Gava ku sewalê hov van dengên wan dibihîse, dibêje 'hûn jî çima wekî min naaxivin' û li wê derê gelek beqan jî dikuje. Ev sewalê hov li vê rûbara xweşik her kesî diçemsîne. Êdî her kes jê aciz bûye.



Tu sewalên din ên li wir ji wî sewalê hov hez nakin.

Çêlîka ku ji kuştinê xilas bûbû, bê hêlîn û bê dê dimîne û gelek jan û êşe dikişîne. Car caran li ser keviran, car caran jî di nav pûş û pelûşan de radizê. Qet kirinên sewalê hov ji bîr nake û li planê tolhîlanînê difikire. Rojekê biryarê dide ku plana xwe pêk bîne. Vê plana

xwe jî ji dostên xwe beqan re vedibêje.

Beqên ku wekî çêlîkan bi zilm û zordariyê re rû bi rû mane, ji bo vê qerarê gelekî kêfxweş dibin. Hemû bi hev re diaxivin û plana xwe amade dikin. Dibêjin 'Êdî ji sewalê hov wextê tolhîlanînê hatiye'.

Di wexteke ku sewalê hov radizê de, çûkê çêlîk bi wêrekî

êrîşî ser sewalê hov dike û bi nikula xwe çavên wî derdixe û çavên wî kor dike. Dû re difire cem beqan, tiştên ku kiriye ji wan re vedibêje û wiha dibêje: "Niha jî hûn herin ber kêşê? Li wir bikin weq e weq. Gava ku dengê we here sewalê hov, wê hêrs bibe û êrîşî we bike. Lê ji ber ku çavên wî kor bûne, kêş nabîne û wê tê wer be."

Beq bi baldarî li çûka çêlîk guhdar dikin û gotina wê dikin. Sewalê hov gava dengê beqan dibihîze bi aliyê dengê jê tê ve dibeze lê ji ber ku çavên wî kor in nabîne û di wî zînêr wer dibe û û perçe-werçe dibe. Çûkê biçûk û beqan bi vî awayî tola xwe hilanî.

Mirina sewalê hov hemû sewal û giyanewerên li ber vî rûbarî dijîn kêfxweş dike. Hemû li hev dicivin û vê bûyerê pîroz dikin.

AHMEDO

## Hejmarok

\* Kodê kodê

Kod barûdê

Zingil zeve

Mîr Mistefa

Lipke tirî

Digindirî

Di marên reş

Di gulên geş

Mîr xatûnê

Ez û te xweş

\* Yek dudo

Bawer sisê

Çeqla te çeqla

fisê

Amo dino

Şelik Şîno

Qasra Elî

Çardeh derî

bûk reqisî

Keç hekisî

\* Aaaaa

Hela amer

Çale cember

Baskê kember

Dil keder

Desê tusê

Nav milusê

Make tarî

Bil bizerî


Çermê cêlê

Feza gurî

BERHEVKAR:

ŞEMSETTIN ASLAN

## Hevalno werin em cihên vala dagirin û televîzyona xwe MED'ê bêhtir nas bikin



\*Yekemîn televîzyona kurdî, ..... ye.

\*..... ji Înglîtereyê weşanê dike lê stûdyoya wê ya mezin li Brukselê ye.

Di nav weşanan de a herî demokrat, ..... ye.

\*Televîzyona ku çanda me bi me dide nasîn, ..... ye.

\*Televîzyona ku dengê gelekî ku li çar aliyên dinê belav bûye dike yek, ..... ye.

\*..... dîroka gelekî bindest ku dijmin dixwazin li ser rûyê dinyayê tune bikin derdixe pêşberî çavan.

\*..... rastiyan dibêje, derewan nake.

\*..... derewên dijminên mirovahiyê derdixe holê.

\*..... alîgirê bindesta ye, alîgirê heqiyê ye.

\*Dijminê mezin ji weşana ..... ditirse ji ber ku gelên din ên bindest jî şiyar dike.

\*Îro bi daxwaza TC'ê dewletên di nav komploya navneteweyî ku Serokê kurdan dan girtin de cih girtine dixwazin dawî li weşana ..... bînin.

\*Emê li televîzyona xwe ..... xwedî derkevin.

\* Hevala we Evîn li benda nameyên we ye.



# Ji devê çavdêran: Dêrsim'38

Tevkujiyên ku dewleta tirk di navbera salên 1919 û 1940'î li ser gelê me pêk anîne, neketine nava rûpelên pirtûkên dîrokê. Bi hezaran lêqewimiyên wan tevkujiyan hebûn, hê jî hinek ji wan hene, lê kesî ji xwe re nekiriye kar ku bûyerê ji devê wan bigire û tomar bike, wekî belge pêşkêşî cihanê bike. Lêqewiyên bûyeran yek bi yek koça xwe ya dawîn dikin û ji bo me jî belgeyên bêhempî ji holê radibin.

Lêkolînerê kurd Mûnzûr Çem jî bi vî bîr û ramanê, bi şahidên Terteleya Dêrsimê re hevpeyvîn pêk anîne û ew hevpeyvîn di pirtûkê de berhev kirine. Ev pirtûk bi navê "Tanikların diliyle Dersim '38" di nav weşanên Pêrî de hatiye çapkirin.

Her wekî ji navê pirtûkê jî diyar e, Mûnzûr Çem ev hevpeyvînan ku bi kurdî (kurmançî, kirmanckî) ne li tirkî wergerandine. Hinek ji wan hevpeyvînan bi kirmanckî di nav rûpelên kovara Vateyê de cih girtibûn.

Pirtûkê bi pêşgotineke dûvedirêj dest pê kiriye. Di vî pêşekê de li ser rengê nijadperestiya dewleta tirk û tirkîdarî vî yekê jî, li ser nêzîktêdayîna dewleta tirk a bo Dêrsimê radiweste.

## Tanıkların Diliyle Dersim '38



Tiştên ku wekhevî û cudatiya di navbera nijadperestiya tirk û nijadperestiya Hitler û Musolonî de hatine gotin gelekî balkêş in. Wisa xuya dike mercên dîrokî civakî yê ku nijadperestiya tirk dirûv girtiye dest nade ku tirk nijadperestiyeke wekî ya Hitler û Musolonî bimeşînin, lê di taliyê her du cure nijadperestî jî çewsandina gelan didin ber xwe, lewre jî li dijî mirovatiyê ne.

Ji ber ku tevkujî destkirê heman hêzê ne, serboryên kesan pir hindik nêzî hev in, leşker mirov ji gun-

dan ber hev dikin û dibin li geliyekî, li cihekî nediyar gulebaran dikin.

Divê bê gotin ku armanca dewletê di pêkanîna van tevkujiyan de ne şikandina serhildana gel e. Tevkujî piştî ku serhildan şikestiye pêk hatiye. Li aliyê din kesên ku leqayî tevkujiyê tîn, bi piranî ne kesên serhildêr in. Gelekên wan li nik dewletê ref girtiye, lê dîsa jî ew kes ji tevkujiya dewletê rizgar nabin.


Li vir divê mirov rûreşiya xiyantekaran jî ji bîr neke, hinek kes ji bo berjewendiyên xwe yê rojane û biçûk cîranê xwe didin destê leşkeran. Bo nimûne di serborya yekî de hatiye gotin ku mirovekî bo ku dest daye ser çend bizinên yekî din ew daye destê leşkeran. Ev yek jî nîşan dide ku civak hê jî di warê hestên neteweyî de tîr nekemiliye û li pey berjewendiyên biçûk e.

Pirtûk li ser kaxizeke bi qalîte hatiye çapandin û jî 216 rûpelan pêk tê. Di berga pêşîn a pirtûkê de wêneyekî dîrokî di ya paşîn de jî wêneyê kesên ku bi wan re hevpeyvîn hatiye kirine heye. Ji bo kesên ku dixwazin Terteleya Dêrsimê ji devê lêqewimiyên bûyerê bibihîzin, ev pirtûk gelekî sêdewar e.

SERWÎSA ÇANDÊ

Ji kovara War dosyayek taybet

## Bûyera S.Elçi û Dr. Şivan



- Mabad: Cûmhuuriyeyê'nin Kurultûyê ve Bûyax Gûlennê Pirtûkên: 1941-1946
- Dosya: Yekîniyeyê Salid Elçî ve Dr. Şivan çiyê: Dîroka EŞREFIYAN, ŞERAFETTİN, GÜÇLÜ, DERWÊŞE SADO, MAHMÛD LEWENDÎ, ŞERAFETTİN ELÇÎ, CÛDÎ
- Etnolojîya Zîmare Kurdî: AŞKINAN, KIRMANÇKÎ
- Partîya Mirazê: AŞKINAN, KIRMANÇKÎ
- Çerçevaya Komarî ve Hîzûmî Teyarî: AŞKINAN, KIRMANÇKÎ
- Bûyera Hêşîkê Elîos u Rewşa Hinek Kesên Dêrsimê: ŞERAFETTİN
- Mîrî û Dîwîyê: AŞKINAN, KIRMANÇKÎ
- Dostîkîyên Cîladî: AŞKINAN, KIRMANÇKÎ
- Fehmîg - Vajname: KIRMANÇKÎ, MAHMÛD, GÜÇLÜ, DERWÊŞE SADO, MAHMÛD, LEWENDÎ
- Ji Şivan: AŞKINAN, KIRMANÇKÎ
- Dêrsim: AŞKINAN, KIRMANÇKÎ

HEJMAR - SAYI: 7 ZIVISTAN - 1999

Hejmarê 7'an de Warê derket. Di nav rûpelên kovarê de gelek li mijar hatine kolandin. Nivîsa pêşîn li ser Komara Mehabadê ye. Ev nivîsa bi îngilîzî ya A.A. ji hêla M. Güneş ve li tirkî hatiye wergerand.

Di nivîsê de li ser girîngiya vî komarê hati-


ye rawestandî.

Mijara ku herî zêde di nava rûpelên kovarê de cih girtiye, dosyaya li ser bûyera Saîd Elçî û Dr. Şivan (Saîd Kirmizitoprak) e. Li ser vî mijarê kesên mîna Şakir Epözdemir, İbrahim Güçlü, Derwêşê Sado, Mahmûd Lewendî, Şerafettin Elçî û Cûdî radiwestin. Piraniya nîviskarên nêzî Saîd Elçî ne, lewre jî dirûvê rastîna vî bûyerê dernakeve holê.

Ji bilî vî dosyayê gelek mijarên din ên cihêrang jî di nava rûpelên kovarê de cih digirin.

## Ma qey namûs bi me re tune ye, hûn hatine ba me?

HASAN KAYA



"Heyeta me ya xebata propaganda û hilbijartinê" malên ku beriya niha dengên xwe dabûn partiyên serdest tesbît dike û serî li wan dide. Li wan malên ku hêj baş zanîna wan a neteweyî nestewiyaye, belkî sed carî me ev gotina li jor bihîst. Ew kesên ku em ji wan hêvî nakin, dibêjin "Ma yekcar namûs bi me re nemaye?" Helbet vî carê emê raya xwe bidin gelê xwe. Di civaka kurdan de guherîneke sosyolojîk a berbiçav dixuyê. Heç ku civakê bi hev re peymanek çêbiribe bi yek dengî dibêjin, "yê ku bi qasî serê derziyê xîret pê re hebe ew jî tifaqê dernakeve." Tu kes zêde jî li ser vî guherîna ku bi wan re çêbûye nasekine. Tu kes nabêje, ji ber filan sedeman, ji ber bêvan qewmînan hişê me hate serê me, an jî çavên me vebûn. Heçku fihêt, dikin ji maziya xwe.

Gelek caran ez bûme şahidê xebatên di

nav gel de, beşdarî sohbetên hişyarkirinê û zanakirinê bûme, lê tu caran mîna vî carê mirov zû û bi hêsanî îkna nedibûn. Ew bi xwe rê ji ramana neteweyî re vedikin, karê me hesanî dikin. Nahêlin ku mirov bi saetan ji wan re bipêyive. Heta gelek kes ji ber ku em qala rewşa gelê kurd ji wan re dikin ber xwe dikevin, dilê wan dimîne, wekî ku em wan sêdardar wan bikin dikevîne halê xweparastinê. Heta em ji ba wan radibin sed sondî dixwin ku ew dengên xwe ji HADEP'ê pê ve nadin tu kesî. Gelek mirov li xwe mukir jî tîn, dibêjin "ma emê çima derewan bikin, me cara din da REFAH'ê an jî CHP'ê lê vî carê emê bidin HADEP'ê."

Her çiqas ne zêde be jî em carinan rastî hinek mirovên ne kurd tîn ku ew jî dibêjin; "emê raya xwe bidin we." Dema em hinekî dixwazin sedema vî helwesta wan hîn bibin, dibêjin ku HADEP bikeve meclîsê belkî lihevhatinek çêbibe û şerê ku li holê ye bê rawestandî. Têkiliyên cîraniyê yê erênî û helwesta medyaya tirk a xerab hiştîye ku ramaneke wiha bi van kesan re çêbibe.

Jixwe ez pêwîst nabînim xebat, kêferat, çoşî û hewldana welatparêz, xebatkar û al-

girê têkoşîna vebêjim. Belkî di dîrokê de cara yekemîn e ku kurd bi girseyî bi tem-poyeke wiha şidayî dixebitin. Xew ji kesî re nîn e. Civîn, ger û serdan heta sisê çarê şevê dom dikin. Hestê neteweyî tiştêkî wiha ye yê ku hîn bû nikare dev jê berde. Ev hest mîna gir e. Ku kete canê mirov, tebata mirov nayê. Ez lê dinêrim yê ku tebata wan nayê pir zêde bûne.

Li hemberî vî pêşveçûnê hinek heval henekan dikin, dibêjin "ku em bibin partiya yekemîn û bibin îktîdar emê çî bikin?"

Tevî van hemû pêşveçûnan listikên sistêmê yê li ser kurdan neqediyanê, kurdên ku li ser gel bazarê dikin, karê xwe bi rê ve dibin, pir in. Herêmparêzî, êlparêzî û malbatparêzî hêj ji holê ranebûye. Li ser navê van têgihan gelek sîmsar di nav gel de ji bo berjewendiyên xwe mîna fetbazan li xapandina gel dinêrin. Di van xebatên hilbijartinê de yê ku serê mirov diêşînin bi piranî ev in.

Bi rastî wekî gel gelek caran hêviyên me hatin şikandin, gelek caran şahiya me nivco ma, em hinekî hînî afatên mezin bûne lê vî carê gelê kurd ji vî hilbijartinê bihêvî ye. Divê ku vî carê hêviya me neşike.



# Bi rastî te eslê xwe winda nekiriye

**R**ojekê mirovek li texsiya xwe siwar dibe û wê ji gundekî biçê gundekî din. Li dûv hinek rêveçûyîne dinihêre ku kerek li ser rê di orta rê de sekiniye. Şofêr li qornayê dixê, dike nake ker xwe tev nade. Şofêr hema ji texsiya xwe peya dibe û diçe eniya ker maçî dike û jê re dibêje: "Aferin ji te re. Bi rastî tu kereke heqîqî yî û te eslê xwe winda nekiriye!"

## Selawat

Li gundekî Şemzînanê meleyek welatparêz heye. Rojekê Gerîla diçin mala Mele. Ew rûdinin. Dixwin, vedixwin, wexta nimêjê tê mele dibêje: "Bi destûra we ezê biçim mizgeftê."

Mele diçe ser minarê ku bang bide, dibîne ku leşkerê tirk tèn. Baş dizane ku haya gerîla jê nîn e. Dil dike ku biçê mal xeberê bide Gerîlayan, lê heta biçê mal dereng e. Hema ji ser minarê bang dide û dibêje: "Selawat û selawat, waye roma reş hat de rabin xwe xelas bikin ey xortê welat!"

## Panzêr

Li herêma Çolemergê, navçeya Gewerê, gundê Memberê di sala 1992'an de gundiye bi navê Salih rojekê di ber

qereqolê re derbas dibe dinihêre ku leşkerê li ser zerîpûşê (panzer) rûniştiye. Salih radiweste û dibêje: "De ka ez jê re bibêjim ka panzêra xwe nafiroşe?" Diçe ba leşker û jê dipirse:

- Tu panzêra xwe nafiroşî?
- Belê. ez difiroşim.

Dawiya bazarek kûr û dirêj de bi ser sih milyonan li hev dikan. Salih pênc

milyonan dide leşker û diçe malê da ku pereyên dinê jî bîne. Dema dizivire dinihêre ku panzêr li cihê xwe ye, lê leşker ne li wir e. Diçe hundirê qereqolê li ber serleşker rûdine û dibêje: "Ez hatime panzêra xwe bibim. Waye pereyên te yên dinê." û pere datîne ser maseyê. Serleşker ji ber ku bi bûyerê nizane şaş dimîne û dibêje: "Te aqilê xwe winda ki-

riye, tu behsa çî dikî?"

Salih hêrs dibe, pêçiya xwe dibe ber çavên xwe, çavên xwe nîşanê wî dide û dibêje: "Serleşkerê min li nava çavên min binihêre, hetanî îro tu kesî ez nexapandime ku tu min bixapîni!" Serleşker jî dibêje: "De here panzêr!" û dû ve bûyerê navê wî li gund dibe panzer.

QAHÎR BATEYÎ

## Zarok û mamoste

Azad zarokekî dibistana seretayî ye. Rojekê mamosteya dersa matematîkê azad radike ezmûna devkî û jê pîrsekê dike.

Mamoste:

-Ka bêje kurê min li ser darê pênc çûk hene, dema zarokekê kevîrê bavêje û sê heban ji wan bikuje, li ser darê çend çûk dimînin?

Azad:


- Qet namînin?

Mamoste:

- Çawa qet namînin?

A zad:

- Mamoste zarokê kevîrê bavêje, dê yên mayî jî bifirin herin.



## BI XELAT...

## XAÇEPIRSA BI XELAT (168)

## XAÇEPIRSA

Çerçevê	T	Ş	E	P
S	I	N	A	N
E	M	B	A	Z
Ş	E	M	R	I
M	A	K	T	O
Z	A	N	A	R
R	D	T	E	T
O	I	R	E	P
E	N	E	R	S
A	V	S	E	R

### Bersiva Xaçepirsa 166'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin ber destê me, em dê wan binixînin û bi rîya peşkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 168'an Kaseta Metih-Kemal Kahraman 'Ferfecir' e.

Metih & Kemal KAHRAMAN




### Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

kesên xelata hejmarê 166'an; Kaseta Koma Çiya 'Venamirê' qezenç kirine ev in: Bengî Bengîn/ Meletî

Kis	Akvaryûm	...Krusova	Naveki	Balif	Sembola
Serleşkerê	Kesê di	derhênerek	mêran	Kinivisa	nikelê
ki ARGK'ê	şermê de	Dengdarê	berepaşkî	baceke	
		n nep	Tîpa pêşin	tirkî	
Ji piran re			Girtiyên		
tê gotin			ne siyasî		
Mêweyek			Mirnişinek		
			e kurdan		
		Pêşdaçeke		Dengdarê	Bersiva
		k		n veg	neyênî
		Dengdarê			
		n kor			
Rençberî					
Tipeke				Rojek	
kurdi					
	Bi kirdkî		Tîpa pêncan	Bayindir	
	gel			Kesê jina	
	Cephe, enî			xwe ji dest	
				daye	
Tîpa	Tîpa dû	Ajansa			
duduyan	m'yê	kurdan			
Statû	Cih	Awayekî			
		gîrinê			
			Pêşdaçeke		
			k		
			Nexweşiye		
			k		
Xwedayek		Stêrk			
Navçeyeke		Tipeke			
Dilokê		kurdi			

PEYVA VEŞARÎ





MEM KAYA



İMRALÎ RA XEBER ESTA

# Öcalan: Wazenê min hucre hucre bikişê

MEMED DREWŞ

Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalanî, hetanî nika qandê (seba) çareserkerdina mesela kurd û a-ardina raya siyasî û demokrasi, hîrê finî adirbirnayin ilan kerd û çend finî jî qandê adirbirnayin û raya ci akerdin firsend de dewleta tirk dest. Feqet, dewlet vernî ra hetanî ewro, tim û tim şer de israr kerd û nêwast ke nê firsendan bivîno. Eke dew-ler tirk adirbirnayinê jewînê de serokê PKK bêcewab nêternayê, ewro bi hezarana xortê şarê kurd û tirk har binde bîbiyê, bi hezarana mayê kurd û tirk roşan de nêbermayê û mezeli ziyaret nekêrdê.

Tabî, mayê tiya mezeli nûsemi belkî no jî rast niyo. Çike ewro hezarana mayê kurdê, zey mayanê tirkan nêşenê şirê mezelanê xortanê xo jî ziyaret bikirê. Coka şeno na mesele wina jî biyaro ziwan. Eke dewleta tirk goş bidayê adirbirnayinê (1993) jewin ê serokê PKK ewro roşan de mayanê tirkan mezeli ziyaret nekêrdê, mayanê kurdan jî qaxûyê (me-raq) mezelanê xortanê xo nekêrdê. Hem mayanê tirkan û hem jî mayanê kurdan, roşan de xortanê xoya piya roşanî pî-roz kerdê. Feqet ker û korinê dewleta tirk ser, no firsend remiya. Remiyayinê nê firsend yan jî firsendan ser, sera 1993 ra na kişt hezarana xortî kişyay, hezarana dewî werte ra hewadiyay, hezarana ma-

Wa bivînê ke no şero lîmino ke 16 seriyo Kurdistan de ra-  
meno wa biqediyoy. Eke êkê ewro namayê "Mayê şehî-  
dan" nayo xora û her fekê xo akerdin de ma kurdan rê  
xeberî danê, nê biyayanî bivînayê na cografya de kesê  
zey Demirel, Ecevit, Yılmaz, Çiler û Erbakan viradê  
serokomar û serokwezîrîn, înan nêşayê bibê muxtar.

yan û wayan zey awa eynî hesrê çiman  
rijnay. Hend cenî viyay mendî û hend jî  
qeçekî (domanî) seykur (seyek) mendî.

Kambi sebebê nê pêrin. Bêguman  
dewleta tirk. Lazim o ke xortê kamî  
1993'ê ra na kişt, nê şerê lîminî de kişya-  
yo, kiştoxê înan serdarane dewlet bivîno.  
Bi taybetî jî êkê nameyê "Mayê şehîdan"  
nayo xora û her fekê xo akerdinde kur-  
dan û serokê ci rê xeberî danê, wa ê bi-  
vînê.

Wa bivînê ke peyniya na gunî rijyayin  
bêro.

Wa bivînê ke xortê kurdan û tirkan  
mekişiyê.

Wa bivînê ke no şero lîmino ke 16 se-  
riyo Kurdistan de rameno wa biqediyoy.

Wa bivînê ke peyniya serdestan û ser-  
darane dewleta tirk bêro.

Wa bivînê ke kesê zey Demirelî wa  
mebê serokomar û kesê zey Ecevit, Yıl-  
maz, Erbakan û Çiler mebê serokwezîr.  
Hem jew serokomar û serokwezîr tenya  
jî nê. Eke êkê ewro namayê "Mayê şehî-

dan" nayo xora û her fekê xo akerdin de  
ma kurdan rê xeberî danê, nê biyayanî bi-  
vînayê na cografya de êkê nameyê ci no  
cord ravêreno viradê serokomar û serok-  
wezîrîn, înan nêşayê bibê muxtar.

Tabî her çiqas niyê benê û serdarê  
dewleta tirkê şer de û gunî rijnayin de is-  
rar kenê jî, Serokê Giştî yê PKK Abdul-  
lah Öcalano qandê rindîna şarê kurd û  
tirk aşî de israr keno. Ze ke cord jî vaji-  
ya hîrê finî adirbirnayin û çend finî jî ra-  
ya adirbirnayinî akerdin de gamê verinî  
ey çekerdi û dewlet goş nêda ci. Viradê  
goşdayin, dewlet qandê peyniya Öcalanî  
ardin tertele viraşt (Terteleya Basa/ Güç-  
lükönak yena ma vîrî). Peynî de wasten û  
verniyina pîlanê (efendiyanê) xo de me-  
sela Kibrîsî de tawîz da Yewnanîstan û a  
îkna kerd û GAP jî da Îsraîl û vera GAP'î  
serokê PKK wast. (Kesan remnayin de  
tecrubeyê Îsraîl esto, çike ay Eichman  
Arjantin ra remnabi). Peynî de komplo  
viraziya û ajananê Îsraîl Öcalan Kenya ra  
tepişt ard Îsraîl de dest girêdaye û çim ra-

cenaye teslimê Tirkîye kerd. Xora o roj  
ra tepiya dewlet çiçi kerd eşkera yo. Va-  
ten ke ca de bo dewlet dest û lingê ci goş  
û çimê Öcalanî girêdaye. Ma verî jî nûst  
ne jew rojname û kovar yan jî tevayo bîn  
danê Öcalan. Heta ez no hefte mûsaya ke  
dewlet seata Öcalanî ci dest ra girota û a-  
bûkatana pêdiyin viraştin de jî çend şertî  
dayê Öcalanî û abûkatan ver. Nê şertî jî  
wina yê:

Abûkatana pêviyayin qedexe yo.

Teva pêdayin qedexe yo.

Kurdî qışeykerdin qedexe yo.

Yanê rewşê Öcalanî de vuryayin çini-  
yo. Dewleta Girawê İmralî de rewşê Ö-  
calanî her roj heveya kena giran. Aya  
winakerdina wazena îradeyê Öcalanî biş-  
kino û bado vejo mehkama ver. Çike  
dewleta Öcalanî ra tarsena û aya nê tarsê  
xo raya nûstoxanê xoya ana ziwan. Çiçi-  
yo no tars. No tars o yo ke, Öcalan' o 75  
seranê dewlet biyaro çiman ver û oyo  
dewlet suçdar vejo. Coka aya wazena ke  
verî îradeyê Öcalanî bişkino û bado vejo  
mehkama ver. Öcalan' o na politikaya  
dewlet wina ano ziwan: "Dewleta waze-  
na mi hetê fizîkî, fikrî û hîsî ra hucre huc-  
re bikişo".

Feqet ancina jî oyo her hefte raya abû-  
katana mesajanê aşî rêşeno û vano eke  
îmkan bidiyo ma şenê qandê destfistina  
aşî rolê xo kay bikim. Tiya jî karo kew-  
no mildê aştiwazan ser.

**WELAT**  
ROJNAMEYA HEFTEYÎ  
(Haftalık Gazete)

Xwedî (İmtiyaz Sahibi)  
M. NURİ KARAKOYUN  
Yönetim Yeri:  
Atatürk cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308  
Beşiktaş/İstanbul  
TEL: (0212)

245 16 50 - 251 79 37 - 251 90 13

FAX: 251 95 85

Gerinendeyê Giştî yê Weşanê  
(Genel Yayın Yönetmeni)

SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsarar

(Yazı İşleri Müdürü)

M. SALİH TAŞKESEN

ÇAPXANE

Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

Yayın Koordinasyon:

Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

BELAVKIRIN

BIRYAY Dağıtım

NIVİSGEHÊN TÊKİLİYÊ

(İrtibat büroları)

Amed:

Tel: 0 (412) 223 34 83

Mêrsîn

Tel: 0 (324) 233 83 96

İzmir

Tel-fax: 0 (232) 425 37 02

Edene

Tel: 0 (322) 351 42 78

(Nûnerê Giştî yê Ewrûpayê)

Mahmut Gergerli

Tel: 49 871 672 29

Fax: 49 871 670 815

Swîsre:

Ihsan Kurt

Tel-fax

41 21 652 76 07

Fransa:

M. Ali Doğan

Tel- 33 614 32 43 55

Belçika

I. Can

Tel: 32 53 64 12 41

Hollanda:

S. A. Fewzi

Tel-Fax: 31 10 48 555 43

Almanya:

Fener Rojbiyanî

Tel: 49 228 92 51 284

Suriye:

Jana Seyda

Helim Yüsiw



# Digel êrîş, astengkirin, qedexekirinan ji HADEP di qadan hilnehat

Serdozgerê Komarê Vural Savaş rêz û rêçikên dewletê jî bînpê dike û ji bo ku HADEP nekeve hilbijartinê çî ji destê wî tê dike. Li gorî wî HADEP dê bi riya hilbijartinê bi hezaran terorîstî bike mebûs, serokê belediyyan û dê hilbijartinê wekî referandûmekê bi kar bîne. Her wiha çewisandin û astengkirinên li ser HADEP'ê bînavber didomin. Lê digel van rûdanan jî HADEP bêwestan û rawestan li gorî karîna xwe xebatên xwe didomîne.

## Wan

Roja 9'ê avrêlê HADEP'ê li Wanê mîtingeke mezin li dar xist. Digel ku girseya ku ji tax û navçeyên derdora wanê bo mîtingê bi rê ket, hate astengkirin jî 50 hezar kes beşdarî mîtingê bû. Mîtingê li ber Ezberciler İşhanîyê bi hatina otobûsa HADEP'ê re dest pê kir. Birêveberên HADEP'ê bi slogana "Bijî HADEP" hatin pêşwazîkirin. Bi heza-

tingê bû. Di dema ketina qada mîtingê de gel beramberî lêgerîna polîsan ma û destmalên kes, sor û zer hatin desteserîkirin.

Li aliyê din li gelek bajarên Tirkiyeyê xebatên HADEP'ê yê hilbijartinê bêwestan û rawestan didomin.

Stenbolê jî digel mîtingên ku navçe bi serê xwe li dar dixin HADEP'ê roja 9'ê avrêlê li Şişli Qada Abide-i Hürriyetê mîtingeke mezin li dar xist. Li dora 15 hezar kes beşdarî vê mîtingê bû. Her wiha digel hemû astengkirinên dewletê û êrîşên faşîstan jî mîtingên ku bi hezaran kes beşdar dibin her roj li çend navçeyên Stenbolê tene lidarxistin.

HADEP'ê li Tarsusê jî mîtingeke ku 15 hezar kes beşdar bû li dar xist.

## Amed

Li gorî biryara ku HADEP'ê girtibû diviyabû ku di 13'ê avrêlê de li Amedê mîting bihata lidarxistin. Lê hêzên dew-



girtin. Li ser vê rûdanê gel dîsa li gelek cihan li hev dicive û vê helwesta dewletê protesto dike. Li deverên mîna Dağkapı, Büyük Postahane û Yenîşehîrê di navbera hêzên dewletê û gel de pevçûn çêdibe. Her wiha hêzên dewletê li ber Sînemaya Dîlan êrîşî girseyeke ku ji hezar kesî pêk tê dike û gel li hundirê sînemayê asê dike. Nivê girseya gel di hundirê sînemayê de dimîne û hêzên dewletê wan derdest dike. Li gorî agahiyên ku ji herêmê hatine 15 hezar kes hatiye girtin. Di nav kesên ku hatine girtin de gelek birêveber, berendamên mebûsiyê û belediyyeyê yê HADEP'ê jî hene. Gel di qereqol û avahiyên din ên dewletê hilnehatiye lewre jî hêzên dewletê gel biriyê Salona Sporê ya Sergirtî. Dîsa li gorî ragihandinan sed hezar kes beşdarî mîtinga HADEP'ê bûye. Lê ger dewletê destûr bida dê li dora 200 an jî 300 hezar kes li hev bicivîya.

Li ser vê rûdanê Wekilê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelik daxuyanîyek da çapemeniyê û ev yek şermezar kir. Özçelik di daxuyanîya xwe de diyar kir ku li seranserî Tirkiyeyê xebatên wan yê hilbijartinê tene astengkirin lê bi taybetî li Amedê bi destê waliyê bajêr beramberî astengî û çewisandinên tund dimînin. Özçelik daxuyanîya xwe wiha domand: "Divê bê zanîn ku ji bo ku gel tercîh û daxwaza xwe bi awayekî eşkere û azad bide der tu mercên demokratîk tune ne. Rayedarên dewletê yê ku divê bêlayan tevbigerin, xebatên partiya me asteng dikin, ji bo ku şênîyê gundan dengên xwe nedin HADEP'ê gefan li wan dixwin. Ev yek jî rewşa hilbijartinê darî çavan dike. Ji bo ku hilbijartin bi rengekî demokratîk biçê serî divê Wezareta Karê Hundir, Waliyê Amedê Nafiz Kayalı, Mudurê Ewlekariyê Gaffar Okan û berpirsên din ên bajêr ku bi heman şeweyî tevbigerin ji wezîfeyê dûr bixe."

NAVENDA NÛÇEYAN

## BEND NE FERAT NE DÎJLE NE JÎ HADEP'Ê DIKARIN ASTENG BIKIN

RÊNAS KAYA / AMED

Piştî ku çalakiyên hilbijartinê dest pê kirin, HADEP beramberî çewisandin û qedexekirinên tund ma. Waliyê Amedê Nafiz Kayalı helwesta dewletê ya li dijî HADEP'ê di beyanata xwe ya di Rojnameya Radikalê de da der. Her çîqas HADEP'ê daxuyaniya Kayalı wekî rûdaneke xembar nîrxand jî lê bawer dikir ku dê bikaribe mîtingê li dar bixe û wekî 95'an sed hezaran bigihîne hev.

Dem a ku em çûn HADEP'a bajêr xebatên bo rapera Amedê didomîyan. Li ser sloganan bi saetan gengeşî çêbûn û ji me jî hate xwestin ku em tevî gengeşiyê bibin. Di banga HADEP'ê ya bo meşa azadiyê de slogana "Bend ne Ferat ne Dîjle ne jî HADEP'ê dikarin asteng bikin" jî di nav de em li ser gelek sloganan fikirîn. Peyre em li ser ramana divê bo Amedê paqij, hêşîn û nûjen birêveberiyê gel û mifteyê jî HADEP hilbigire, li hev hatin.

Li rêxistina bajêr xebat bi dilgermî qedîyan. Bi bawerîya ku ev mîtingê ji ya 95'an geştir û girseyitir be herkes bi heycan li benda mîtingê ma. Geşbîniyê berî mîtingê 14 saetan şûna xwe ji reşbîniyê re hişt. Muduriyeta Ewlehiyê ya Amedê bi hinceta "ewlehiyê" mîting qedexe kir. Di vê kêliyê de balyozgerê Amerîkayê yê Edeneyê li Amedê bû. Bi birêveberên HADEP'ê re axivî. Ji rûdanên navborî hate agahdarkirin. Konsolos diyar kir ku ew li bûyerên kiryar nediyar dikole lewre jî gotinên HADEP'yan ne li ser bala wî bûn.

Ji bo ku helwesta gel a li ser mîtingê hîn bibim ez çûm semtên Suriçi û Bağlarê. Ez dibêjim 'gelo dê wekî Newrozê destûrê nedin mîtingê' peyre dibêjim, 'Na, gel dê derkeve qadan.' Ji kêf û şahiyê lingê gel erd nagire. Li benda derketina tîrêjên rojê ye.

Xewnerojk bi tîrêjên rojê re dest pê dike. Hemû kuçe û kolan, rê hatine girtin. Tevaya gelê Amedê li derve ye. Polîs mirovên derdikevin derve diavêjin hundir. Hetanî mîtingê 15 hezar kes hate girtin.

Lê li Amedê tu partiye 15 hezar li aliyekî 5 hezar kes jî neanîbû cem hev. Her çîqas mîting pêk nehat jî gel bersiva dewletê dayê. Jixwe ji hejmarê kesên derdestkirî ev yek berbiçav bû.

Dewleta ku bi bînpêkirina rêz û rêçikên xwe gel asteng kir gelo dê bikaribe rê li ber vîna gel a ku dê di sandoqan de xwe bide der bigire? Gelê kurd dê bersiva xwe bide. Gel li Amedê digel qedexeyê jî derkete kolan û qada mîtingê û bersiva terora dewletê da.



ran jinên ku xwestin têkevin qadê bi hinceta ku tê hilnayên hatin astengkirin. Li ser vê jinan bi dirûşme û tîlîliyan piştgirî da girseyê. Her wiha li Kolana Cumhuriyetê 8 hezar kesên ku li hev civiyan ji aliyê panzeran ve hatin belvkirin.

Her wiha piştî mîtinga li Wanê konvoya HADEP'ê derbasî bajarên Sêrt û Bedlîsê bû. Li van bajarên jî ji aliyê bi hezaran kesî ve bi tîlîlî û çepikan hate pêşwazîkirin.

## Êlih

Li Êlihê li Qada Cumhuriyetê ji aliyê birêveberên partiye yê bajêr ve di 12.4.1999'an de mîtingek hate lidarxistin. Li gorî ragihandina çavkaniyên herêmî li dora 70 hezar kes beşdarî mî-

letê bi biryara waliyê Amedê Nafiz Kayalı êvara berî roja mîtingê bi awayekî devkî ji birêveberên bajêr re dibêjin ku mîting hatiye betalkirin. Hêzên dewletê jî bo ku rê li ber mîtingê bigirin hemû riyên gund û navçeyan ên ku diçin Amedê digirin, girseya ku diçe bajêr an vedigerîne an jî derdest dike û erebeyên gel desteser dike an jî asê dike. Her wiha li navenda bajêr jî ji bo ku gel neçe qada mîtingê hemû kuçe û kolan digire, bi hezaran mirovan derdest dike. Lê digel van hemû astengî û çewisandinan jî bi deh hezaran Amedî serê sibê saet li dora 10:00'an li Qada Dağkapıyê tene cem hev. Di heman kêliyê de polîs êrîşî gel dikin. Gel bi sloganan bersiva hêzên dewletê dide. Di encama vê pevçûnê de bi hezaran mirov birîndar dibin û tene